Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar 1334 | 17-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Çalakvaneke Çînî ezmûna şoreşa jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê belge dike

Hêvî Keleş/ Qamişlo

**Çalakvana Cînî Yashuang destnîşan kir ku ezmûna femînîst li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hêjayî lêkolînek kûr e û ew wekî yek ji modelên herî berbiçav li Rojhilata Navîn ji bo veguherîna civakî ya li ser bingeha felsefeya azadî, wekhevî û demokrasiyê ye.**



Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rastî danûstandinên zêde yên lêkolînerên navneteweyî tê. Di vê çarçoveyê de, lêkolînerek ciwan a Çînî Yashuang xebata xwe ya meydanî li ser şoreşa jinan û rola ramana rizgarîxwaz di bihêzkirina jinan de di çarçoveya projeya Rêveberiya Xweser de didomîne.

Lêkolînera ku di lêkolînên zayendî û veguherînên civakî de pispor e, dixebite ku ezmûna femînîst a ku di salên dawî de li Rojava derketiye holê belge bike, bandora felsefeya rizgarîxwaz a ku tevgera femînîst li ser ava bûye bişopîne, ka ew çawa beşdarî avakirina civakekê bûye ku jin tê de di biryardan, parastin û saziyên perwerdehiyê de roleke girîng dilîzin.

**Serdanên meydanî û hevdîtinên bi rêberên jin re**

Di serdanên xwe yên bajarên wekî Qamişlo, Hesekê û Kobanê de, lêkolîner bi hejmarek ji jinên pêşeng û rêxistinên civaka sivîl, herwiha Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) û saziyên edaleta civakî re civiya. Hevpeyvînên wê li ser mekanîzmayên biryardanê di nav rêxistinên jinan de, asta guhertina di avahiya civakî de û bandora qanûnên nû li ser jiyana rojane ya jinan sekinîn.

Lêkolîner Yashuang dibêje; "Weke jineke çînî ku jiyana xwe di nav du civakan de bi xwe re hevgirtî ye, ez dibînim ku hewldana jin li vir ji bo azadî û aştiyê, hestêkî bi nav jinan hemû cîhan re heye. Ji ber vê yekê, ez difikirim ku azadiya jinan ne bi tenê ji bo jinan girîng e, lê ji bo aştiya herêmî û civaka demokratîk jî bingeh e."

Lêkolîner destnîşan kir ku ezmûna femînîst li Bakur û Rjhilatê Sûriyeyê hêjayî lêkolînek kûr e û ew wekî yek ji modelên herî berbiçav li Rojhilata Navîn ji bo veguherîna civakî ya li ser bingeha felsefeya azadî, wekhevî û demokrasiyê bi nav kir. Wê zêde kir ku balkişandina ser avakirina saziyên femînîst ên serbixwe û afirandina hevsengiyek hêzê di navbera zayendan de yek ji taybetmendiyên herî girîng ên serkeftina vê ezmûnê ye.

Herwiha lêkolîner hewl dide ku vê ezmûnê bi ezmûnên din ên femînîst ên li Asyayê re bide ber hev, bi armanca ku fêm bike ka jin çawa di nav civakên tijî nakokî de dixebitin, dişibin hev û cudahlyên di navbera awayê xebata jinan de. Tê payîn ku encamên lêkolîna wê di kovareke akademîk a navneteweyî de were weşandin, dibe ku deriyê nîqaşên berfirehtir li ser bandora ramana femînîst li ser avakirina civakên berxwedêr û hevgirtî veke.

**Ezmûna Rojava wekî nemûzecik cîhanî ji bo guhertina civakî**

Lêkolîner tekez dike ku rola jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne tenê bi destkeftiyên wan ên siyasî û yasadanînê ve tê pîvandin, lê bi şiyana wan a ji nû ve şekildana nasnameya civakî û rêberiya nifşên ciwan ber bi nirxên edalet û wekheviyê ve jî tê pîvandin. Bi rêya lêkolîna xwe, ew hewl dide ku dengê jinên ku roleke girîng di avakirina modelek civakî de lîstine, belav bike.

Lêkolîna wê li ser ku ev şoreş çawa di astê şexsî, malbatî û civakî de tê jîyan kirin. Di heman demê de li ser têkiliya jin û rêveberiyê ye. Ew dixwaze fêm bike ka çawa şoreşa jin, bi taybetî bi pergala jinan, şêwaza rêveberiyê ya herêmî guherand û çawa rêbazên nû yên biryardanê avadike, ji ber ku di vê civaka nû de, jin ne tenê di rolên civakî de tên şopandin, lê bi rastî bûn beşek bingehîn a rêveberiyê. Jin ne bi tenê karên civakî dikin, lê herwiha peywirên komelî dikin ku di encamê de şêwaza rêveberiyê ya herêmî diguherîne. Armanca wê ew bû ku ku bi xwe bibîne ka çawa jin di nav şer û civaka li benda şerê de dikin, pergalên jinan çawa di rastî de dixebitin û çawa jin di vê nivîsara nû ya civakî de deng û rolê xwe vedigerînin.

Bi vî awayî, ezmûna jinan li Rojava bala lêkolînerên li çaraliyê cîhanê dikişîne, ji ber ku ew yek ji ezmûnên herî dewlemend e di çarçoveya pevçûnên nûjen de û wekî mînakek ji şiyana jinan a pêşengiya veguherînê ber bi civakek dadmendtir û aramtir ve.


## FERHENGA BIWÊJAN

LI SER HESKIRIN Û ECIBANDINÊ
Biserûber e:
- Lihevhatî ye; bedew e; keşxe ye; spehîlaw e.
**Çavê mirov jê têr dibe:**
- Biserûber e; birêkûpêk e; bibejinûbal e; dagirtî ye.
**Çavê mirov têr dike:**
- Bi heman wateyê.
**Çavê wî lê ye:**
- Jê hes kir; dixwaze ji xwe re bistîne.
**Çavê wî tê de ye:**
- Bi heman wateyê.
**Çav berdayiyê:**
- Dixwaze bistîne; dixwaze bibe ya wî; keyfa wî jê re tê.
**Çavê xwe berdayiyê:**
- Bi heman wateyê.
**Destûbirayên axretê ne:**
- Ji hev pir hes dikin.
**Destê xwe li pişta wî xist:**
- Karê wî eciband; keyfa xwe jê re anî.
**Ez çavê wî bixwim:**
-Min jê hes kir; min ji kirinên wî hes kir; keyfa min ji gotina wî re hat.
**Tepa xwe lê xist:**
- Eciband; ji xwe re qebûl kir; ji xwe re destnîşan kir.

**LI SER XWEZA, QANÛNÊN XWEZAYÊ Û REWŞA HEWAYÊ**
**Çav çavan nabînin:**
- Dema dinya pir tarî be hingê tê gotin.
**Deziya ziwa li ser nema:**
- Cilên wî tev şil bûn; dereke ziwa li ser nema.
**Dinya tilîçav e:**
- Pir tarî ye; mirov tiliyan di çavê hev re bike mirov hev nabîne.
**Ezman diriya:**
- Baran pir hat.
**Hetav bû sêl:**
-Bi heman wateyê.
)Hetav ango roj. Dema roj ber bi ava ve diçe weke sêla li ser êgir sor û girover dibe)
**Kûçik xwediyê xwe nas nake:**
- Hewa pir germ e.
Lîstina pisîkê ye, mirina mişkê ye:
- Ji bo hina keyf û seyran e, ji bo hina şîn û êşa giran e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi Kamîreya Ronahî Sadûn



## Sûcên di bin navê namûsê de; feraseta ku pê tê kirin, kî dike û çima?




Namûs, sûcên di bin navê namûsê de, paqijkirina navê malbatê û hwd... ev diyarde hîn jî di nava civakê de didome. Bi taybet li Rojhilata Navîn û Başûrê Asyayê tê kirin. Di Rojhilata Navîn de terbiye û taybetmendiya malbatan zêde ji hev ne cuda ye...**R-2**

## Cîhan û Nazim artêşa heqîqetê



Di serdemekê de ku qadên şer bi qadên hişyariyê ve girêdayî ne, di heman demê de hêza hewayî bi hêza gotinê ve hevseng e, ragihandina azad weke xeta parastinê ya yekemîn ji bo rastî û bîrdanka gelan radibe...**R-10**

## Ji çiraxên wêjeya Kurdî



Helbestvan Ebîr Dirêî yek ji dengên jinan ên navdar û çalak li kantona Cizîrê tê hesibandin ku bi giyanek nûbûyî û afrîneriyeke geş dara edebiyata Kurdî av dide, ew dinivîse ji bo ronahiyeke mezintir ji bo miletekî ku ji helbestê tê dinyayê weke ji çiyayê berxwedanê tê jiyanê.**R-9**

## Mirina komî ya golikan li gundê Um Elfursan ê Qamişlo



Li gundê Um Elfursan ê bajarê Qamişlo ji ber nexweşiya Qulai ya ajalan bi dehan golik mirin û termên wan li nêzî malan hatin avêtin. Ev yek jî bû sedema derketina bêhna xerab û belavbûna kêzikan.**R-8**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1334 | 17-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# Berxwedana ku dîrok nivîsand: Bendava Tişrîn


Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bendava ku bi navê Bendava Şehîdan hatiye naskirin, beriya salekê di navbera hêvî û tirsê de asê mabû, dewleta Tirk û çeteyên wê dixwestin ku bi êrişên hovan e binesazî û jiyana gelên herêmê mehkûmî tarîtiyê bikin, lê îradeya gel û şervanan ew tarîtî şikand û bi berxwedaniya 118 rojan a bi rûmet careke din vîna gel derket ser dika dîrokê.**R-5**





## 'Şêxmeqsûd û Eşrefiyê teslîmiyetê qebûl nakin'

Ji gelên ku ji 14 salan ve li hemberî dagirkeriyê, êriş, dorpêçkirin û siyasetên dewletên herêmî û navdewletî li ber xwe dane û tu carî çok ji dijmin re nedanîne; Gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bûn. Îro careke din li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî wateya vê yekê di cewher de kom dikin.**R-7**



## Geşedanên Sûriyê yên 2025'an

Li Sûriyê piştî hilweşîna rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz, geşedanên cihêreng rûdan. Bi dirêjahiya salekê re gelên Sûriyê bûn şahidê rûdanên cuda û her mehek ji sala 2025'an geşedaneke cuda û bi bandor li şûna xwe hişt. **R-6**

'Ez ji qîmeta lawikên xwe kêm nakim' — Nehîr pale — R-2

Dîzayn û çarenûs — Farûk Sakik — R-4

Qêrîna Bêdeng a Beravê! — Erdogan Altan — R-5

Amerîkî naxwazin rastiya êrişa Palmêra bibînin — Dilyar Cizîrî — R-6

Çand û huner li hember gotara nefretê — Kemal Necim — R-9

# Sûcên di bin navê namûsê de; feraseta ku pê tê kirin, kî dike û çima?

Namûs, sûcên di bin navê namûsê de, paqijkirina navê malbatê û hwd... ev diyarde hîn jî di nava civakê de didome. Bi taybet li Rojhilata Navîn û Başûrê Asyayê tê kirin. Di Rojhilata Navîn de terbiye û taybetmendiya malbatan zêde ji hev ne cuda ye, hema bêje hemû li ser heman firik û kevneşopiyê hatine mezinkirin. Her çendî ol û mezhebên wan cuda bin jî, lê di xeta pergalê de hemû dighînin hev.

**Esma Mistefa**

### Têgîna namûs

Di gelek waran de, namûs wekî tiştekî erênî tê dîtin. Civakên ferdperest namûsê bi taybetmendiyên wekî durustî, rastî û dadperweriyê ve girê didin. Taybetmendiyên ku hemû kesên civakê dikarin ev hebin. Di civakeke ku li ser ferdiyetê hatiye avakirin de her kes dikare serbilind be. Helbet, di civakên komî de, tenê mêr têne rêz girtin. Li gorî van civakan, ji bo ku mêr di jiyana xwe de xwedî namûs bibînin divê jin pir sernizim bin û laşê xwe eşkere nekin. Bi gotinek din di çanda namûsê de şerm serdest e.

Di vir de gelo namûs tenê parastina jintiyê û nederketina derveyî pîvanên civakî, olê, malbatî û kevneşopiye? Ger wisa be çima navê namûsê tenê li jinê tê barkirin, gelo mêr nikare barê namûsê rake yan jî namûsa wî bê jin nîne?

### Bi xwînsarî tên kuştin

Li quncikên tarî yên civakan ku hîn jî bi têgehên kevneşopî yên şaş ve dîlgirtî ne, jin her sal bi navê "namûsê" têne kuştin. Tawaneke bi temamî pêk hatiye û bi xwînsarî hatiye kirin, pir caran di bin hincetên civakî û qanûnî yên nerm de hatiye veşartin, û pirsên bi êş li dû xwe dihêle: Kî jinan diparêze? Û kî kujer hesab dike? Bi vî navî hate kirin, da ku ji sucên din yên tên kirin cuda be. Vê yekê jî bi girêdana (Sucê) bi sedema kujer dibêje ji ber wê kuştiye (namûs) tê rewa kirin.

### Ji aliyê kê ve herî zêde tê kirin û çima

Sûça namûsê wekî kuştina jinekê ji aliyê endamekî malbatê ve li ser navê "parastina namûsê" tê pênasekirin. Ev yek dibe ku bê kirin bê ku ti piştrastiyek ango heqîqeta wê tewana ku lê hatiye barkirin hebe yan nîn be, bê kirin. Pirî caran jî li ser bingeha tewra gotegotekê yanî ji devê hin însana bihîstin; Jin bi navê namûsê tê kuştin. Hevjîn, bira, bav û her wiha xal û mam jî xwe li ber kirina vê sûcê berpirisyar dibînin û dikin weke ku tiştekî herî serkeftî ye. Divê em ji bîr nekin ku her çiqas cezaya wê ya qanûnî di hin welatan de giran be jî, lê belê bi serbilindî û xwînsarî dikin. Ji ber ku sûcdar difikirin û bawer dikin ku qûrbanî (helbet jin) şerm û bêrûmetî aniye ser navê malbatê û pîvanên civak û ol binpêkirine. Ji ber va hişmendiyên hişk, olperest, zayendperest û radîkal jin dibin qurbanî ku di encamê de bi rê û rêbazên ne diyar bên kuştin.

### Li gorî daneyên cîhanî jin herî zêde bi van tewanan û sedeman tên kuştin.

Ji hevjînê xwe veqetandin, redkirina razîbûna zewacê, têkiliyeke ku ji aliyê malbatî ve nayê pejirandin, têkiliya cinsî yê berî zewacê yan derveyî zewacê, bûyîna qurbanê tecawîz an jî êrişa cinsî, lixwekirina cilên ne li gor malbatê, derketina derveyî olê..hwd. Ev hemû jî tên kirin tenê da ku bêjin "me ji bo parastina şerefê kuşt, ango me şerefa xwe paqij kir."

### Civak çi dike, gelo refleksa civak û rêxistinên parastina mafê mirovan û jinan derdikeve yan na?

Ger di sedsala 21'emîn de ewqas kuştin, şidet, revandin û bi taybet kuştinên di bin navê şeref û namûsê de têne kirin wê demê tu kesî û tu rêxistinên parstina mafê mirovan û yên jinan rola xwe nelîstine û xwe berpirsyar nabînin. Ji ber wê ev bûyerên kuştinê di bin çi sernavî û tewanê de dibin bila bibin, lê tu mafê kesî nîne ku jiyana jinekê bidawî bike. Gelek ji van jinên ku hatine kuştin dayîk bûn, gelo rewşa wan zarokan piştî mirina dayîkê çawa bûn? kîjan zagon û qanûn, kîjan urf û ol rêdide ku tu weke mirov li hember kuştina însanekî bila ne jin be jî bêdeng bimînin?

Em di civakê de refleks nabînin, civak zêde lihember van kuştinan dengê xwe nake. Li gor nêrîna min ji ber ew jî bi heman hişmeniyê hatine mezinkirin û perwerdekirin. Di Rojhilata Navîn de terbiye û taybetmendiya malabatan zêde ji hev ne cuda ye, hema bêje her kes li ser heman firik û kevneşopiyê hatine mezinkirin û dişibin hev. Her çendî ol û mezhebên wan cuda bin jî, lê di xeta perglê de hemû dighînin hev. Ji ber wê ev bêdengiya civakê bi taybet di Rojhilata Navîn de şerm û heqarete li hember mirovahiyê.

### Bikuje piştre tekez bike

Piraniya kuştinên namûsê yên ku hatine kirin, tenê li ser gumanê têne kirin. Bêyî ku ti piştrastiyek hebe ka qurbanî bi rastî tewana ku lê hatiye kirin û ew jê hatiye cezakirin, kiriye an na. Piraniya jinên ku bi van hincetan hatine kuştin di dawiya lêkolîn û lêpirsînan de dur be yan nêzîk be hatiye tesbêtkirin ku ew bê guneh û bakir bûn. Li ser vê bingehê gelek mînakên jinên ciwan û xwendekar bê lêpirsîn û lêkolînkirin ka çi pê re hatiye kirin di bin tewanên cur be cur de hatine kuştin.



Bi kurtî qetlên bi navê "şerafê" her sal li çend welatan têne tomar kirin, lê gelek caran ev bûyer ji raya giştî tên veşartin û bi fermî nayên tomar kirin. Ev hindik welatên ku zêdetir bi navê vê diyardeyê têne naskirin:

### Herêmê Rojhilata Navîn û Başûr Asya (zêdetir rûdan):

1. Pakistan, ji welatên herî zêde yên ku li wir qetlên bi navê şerafê bi firehî têne tomar kirin. her sal bi sedan jin ji ber li hember malabatê derketine, yan jî bi buyerên şubhetê, yan jî ji ber zewacê têne kuştin.
2. Afghanistan, bi taybetî li herêmên gundewarî. Bi navê ol tê rewakirin, rûxmî ku ji aliyê olî û zagonî ve qedexekirî ye.
3. Îran, gelek caran bi fermî wek "qetlên malbatî" têne tomar kirin, ne wek qetlên şerafê û rewa ye li gel hikumetê.
4. Îraq, rûxmî qanûnên nûjen, lê di salên borî de gelek bûyer hatine tomar kirin.
5. Sûriya, ji ber şer, bêasayî, û desthilatîya misilmanên xwecih şertên vê diyardeyê zêde kirine. Raport nîşan didin ku ji destpêka sala 2024'an vir ve 38 bûyerên belgekirî li gelek herêman hatine tomar kirin.
6. Tirkiye, rûxmî ku ev bûyer bi zagonan tên cezakirin, lê belê hê jî jin tên kuştin. pirî caran bi navê xwekuştinê tê tepisandin.
7. Misir û Urdin, her çiqas ne zêde ye jî lê belê di salên dawiyê de hatine tomarlkirin.
8. Hindistan, li van deveran jin zêde tête kuştin, herî zêde jî bi tewanên weke zeweca ji derveyî qebîle yan mezheb tê kirin.

Divê em baş bizanibin ku Sûcê Şerefê li tu welat yan dewletekî di aliyê zagonî de nehatiye rewakirin. Lê belê li welatên ku tê de zihniyeta mêrperest, olperest, cinsperest, hizir û hişmendiya qelskirin û tunekirina rol û mafê jinê dibînin, tê bikaranîn. Hêjayî gotinê ye ku gelek qetlên bi navê şerafê nayên tomar kirin û gelek caran ev kes di nava malbatê de tê parastin û bûyerê bi xwekuştinê didin der.

### Zanista Jineolojî wiha namûsê pênase dike

Şeref û namûs du peyvên ser jinan tên barkirin, ruxmî ku herdu jî peyvên ji bo mirovahiyê derketine. Di roja îroyîn de di bin navê namûs de gelek jin têne kuştin. Barkirina van sûcan tenê ser milê jinan jî pêkanîneke bi aqilê baviksalariyê hatiye. Da ku ev têgîn bê fêmkirin ihtiyacek heye em vegerin Êtmeolojiya wê (zanist koka peyvan). Ev peyv çawa hat? ji bo çi peyveke girîng e? çima jin tê bîra me dema gotina namûs derbas dibe ?

Koka peyva "namûs" ji peyva Yewnanî Nomos tê, ku tê wateya qanûn, adet, an kevneşopî. Piştra hêdî hêdî ev peyv derbasî ziman û çandên cûda cûda dibe, û çarçoveya gotinê teng dibe heta digihêje Bekareta jinê. Helbet ev ji bo kûrkirina hişmendiya kirde – biraser , divê kesek ji ya din bi hêztir be, divê yek biçûk be yek mezin be. Heta zilam her tim jinan ji xwe re namûs dibîne. Dr. Newal Seidawî di pirtûka xwe bi navê "jin û cinis" de dibêje "eger namûsa jinê bekareta wê be, namûsa zilam çi ye?" û dibêje "namûsa jin jî mêr jî rastî ye".

Ji bo em ji şiroveyên şaş ser jiyana me hatine kirin rizgar bibi, divê em her vegerin kok û rastiyên veşartî, divê jin her di lêgerîna xwe û xwebûnê de be.

**Ji Pênûsa Jin**

## `Ez ji qîmeta lawikên xwe kêm nakim`

**Nehîr Pale**

Dayîkeke li ser zîhniyete civaka zayendperest mezin bûye, mêr li gel wê pîroz e û peyv bi peyv adetên civaka xwe pêktîne, lê belê ew nizane ku keçên xwe qurbanî lawikên xwe dike.

Keçên wê 3`ê ne ew û her 3`ê lawikên wê li pey hevdû jidayîk bûne. Lawikên wê girîngî nadin fêrbuyînê û wextê xwe zêdetir li kolanê derbas dikin. Keç jî qedexe ye ku bixwînin û fêr bibin. Adeta ku qedexe ye jin bixwînin bûye sedema şikandina jinê. Ev dayîk jî yek ji dayîkên ku li gel xwe difikire pêdiviya keçên wê bi xwendinê nîne, yê pêre bibin alîkar û barê malê rabikin.

Temenê keça wê ya mezin hîna 12 sal derbas nekiriye wê ji dibistanê derdixe da ku pêre bibe alîkar. Dayîk dikeniya û digot:`Em Şawî ji hejmara zêde ya zarokan hez dikin û keçên min bi min re dibin alîkar`. Keçên wê jî daxwaza xwe ya çuyîna dibistanê bilêv dikirin. Lê belê mixabin bav û dayîka wan destûr nadin ku ew bixwîn in. Herî zêde 2 sal derbas bibin keça 14 salî wê bizewcîn in û ya 9 salî wê şûna wê li ber destê dayîka xwe be û zarokan xwedî bike.

Keça mezin xizmet dike û ya 9 salî jî li ber birayê xwe yê biçûk e, dayîk jî ne xema wê ye ku keçên wê temenê xwe di mutfexê de derbas dikin. Li ser pirsa tu çima kar bi lawikên xwe jî nake bertek nîşan da û got`Ez ji qîmeta lawikên xwe kêm nakim`. Keç çi hîs bikin, çi bixwazin û çawa bijîn ne girînge, ji wan tê xwestin ku xizmeta birayên xwe bikin û alîkariya dayîka xwe barê malê rabikin. Mirov nikare bibêje alîkarî, ji ber li ser keçan tê ferz kirin ku dev ji dibistanê berdin û heman karê dayîka xwe bikin.

Di malbatan de bê edaletiyeke mezin li jinê tê kirin. Eger mêr karê malê bikin û berpirsyartî rabikin ji qîmeta wan kêm dibe, lê belê ne pirsgirêke ku lawik hemû wextê xwe li kolanan derbas bikin. Civaka zayendperest çuyîna keçan a dibistanê kiriye pirsgirêk û qedexe kiriye lê belê lawik bi roxmî ku tu berpirsyartî ranakin û feydeya wan li jiyanê tine ye, weke pirsgirêk nabîn in. Ji vê yekê re tê gotin bê edaletî. Ne tenê wekhevî di navbera jin û mêr de tine ye, di bin navê adetan de bê edaletî li jinê tê kirin. Dayîk, bav û tevahiya civakê vê bê edaletê nabînin û çavên xwe ji heqîqetê re digrin. Dîsa lawik li kolanan û keç jî li mutfexê mezin dibin. Di vê jiyanê de komînalbuyîn, edalet û wekhevî nîne. Nafikirin ku jin jî mafên wan hene, divê nirx ji wan re were dayîn û bi rûmet bijîn. Hîna temenê keçan nebûye 5 salî destpê dike xizmeta bav û birayên xwe dike. Li ber destê wan in û pêdiviyên wan pêk tîn in. Hîna ji temenekî biçûk jinê fêr dikin ku qîmeta wê nîne û bav, bira û hevjîn pîroz in.



# Danûstendinên Îsraîl û Misir ji bo girêbesta gazê li pêş dikeve

Girêbesta hinardekirina gazê di navbera Îsraîl û Misirê de ya bi nirxa 35 milyar dolar ji biryara dawî ya temamkirinê ve nêzîk dibe. Di heman demê de ev girêbesta gazê dê heta sala 2040'î bidome.

**Navenda Nûçeyan**

Nîşaneyên derbarê peymana gazê ya di navbera Misir û Îsraîlê de ji betalkirinê ber bi îhtîmaleke bilez a pejirandina dawî ya hikûmeta Îsraîlê di rojên pêş de ve diçe. Ev yek di demên dawî de di medyaya Îbranî de bi berfirehî hatiye ragihandin û pirsên li ser pêkanîna vê peymanê derxistiye holê.

### Têghiştinên biryardar

Parlamenter û pispor pêşbînî dikin ku hikûmeta Îsraîlê dê ji bo armancên aborî peymana hinardekirina gazê bi Misirê re bilez bike, di heman demê de wê peymanê ji hêla siyasî ve wekî kaxizeke danûstandinê di rêziknameyên têkildarî rewşa Xezeyê û pêkanîna plana aştiyê ya Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Donald Trump de; bikar bîne.

Rojnameya Îsraîlî "Globes" ragihand ku di navbera kampaniyên zeviya gazê ya (Leviathan) û Wezareta Enerjiyê ya Îsraîlê de peymanek dawî hatiye çêkirin, ku rê li ber hinardekirina 130 milyar metrekup gazê ji bo Misirê vedike. Rojnameyê vê dawiyê behsa "têgihîştinên biryardar" di navbera kampaniyên berpirsiyar ên pêşxistina zeviya (Leviathan) di nav de (Chevron) û (Newmed Energy) û rayedarên Wezareta Enerjiyê ya Îsraîlê de kir.

Ev yek di demekê de tê ku dezgehên medyayî yên Îsraîlê vê dawiyê diyarkirin ku peymana gazê bi Misrê re dê di rojên pêş de were temam kirin. "Rojnameya Yediot Aharonot" diyar kir ku ev peyman "ji aliyê siyasî û ewlehiyê ve ji bo Îsraîlê girîngiyeke taybetî heye." Di navbera Qahîre û Til Ebîb de peymanên hevkariyê

Di Îlûna borî de, kampaniya Amerîkî (Chevron) ragihand ku wê bi kampaniya xebitandina xetên boriyan yê Îsraîlê re peymanek îmze kiriye da ku dest bi avakirina boriya gaza xwezayî ya (Nitzana) bike, ku dê gazê ji zeviya (Leviathan) veguhezîne Misrê, wekî beşek ji peymanek bi qedera 35 milyar dolarî.

Qahîre û Til Ebîb bi salan e di sektora gazê de peymanên hevkariyê hene, ji dema ku Misrê di sala 2005'an de peymanek îmze kir ku bi rêya boriya El Arîş-Esqelan hinardeyî Îsraîlê bike. Lêbelê, operasyon di sala 2012'an de piştî êrîşên dubare yên li ser boriya li Sînayê hatin rawestandin.

### Girêbesta gazê ji hêla Îsraîl hatibû cemidandin



Wezareta Enerjiyê ya Îsraîlê ragihand ku danûstandinên derbarê dabînkirina gazê di navbera Misr û Îsraîlê de gihîştine qonaxek pêşketî. Wezaretê zêde kir ku hîn jî hin pirsgirêkên mayî yên derbarê peymana dabînkirina gazê ya di navbera Îsraîl û Misrê de divê werin çareserkirin. Girêbesta gazê ya bi nirxê 35 milyar dolarî ya Îsraîl û Misrê, tê payîn heta sala 2040'î wê bidome. Ev girêbest bi biryara Israîlê ji bo parastina berjewendiyên Til Ebîb û misogerkirina nirxekî adil hatibû cemidandin.

Şertê sereke yê ku Îsraîlê berî pejirandina dawî ya hinardekirina gaze ji bo Misrê danî ev e ku buhayê gaza ku ji Qahîreyê re tê veqetandin zêde bike û di hundirê Îsraîlê de li herêmê kêm bike.

# Lihevkirineke sêalî ji bo ewlehiya zeviyên petrola Heglig li Başûrê Sûdanê

**Navenda Nûçeyan**

**Piştî ku Hêzên Piştgiriya Bilez herêm kontrol kir, rayedarên Başûrê Sûdanê bi her du aliyên Sûdanî yên pevçûnê re peymanek imze kir da ku ewlehiya zeviya petrolê ya Heglig misoger bike.**

Zeviya Heglig li başûrê herêma Kerdevan (başûr) e li hember sînorê Başûrê Sûdanê ye. Ev herêm ji dema ku Hêzên Piştgiriya Bilez di Cotmehê de tevahiya herêma Darfûrê li rojavayê Sûdanê kontrol kir, şer lê qewimî. Heglig zeviya petrolê ya herî mezin a Sûdanê ye û avahiya sereke ya hilberandina petrolê ya Başûrê Sûdanê ye di heman demê de çavkaniya yekane ya dahatê ji bo hikûmeta Juba ye. Berdevkê hikûmeta Başûrê Sûdanê Ateny Wek Ateny di civîneke çapemeniyê de got: "Lihevkirinek sêalî di navbera Hêzên Çekdar ên Başûrê Sûdanê, Hêzên Çekdar ên Sûdanê û Hêzên Piştgiriya Bilez de hatiye çêkirin, ku berpirsiyariya ewlehiyê ya sereke ji bo zeviya petrolê ya Heglig dide Hêzên Çekdar ên Başûrê Sûdanê... di çarçoveya zêdebûna aloziyan de."

### Metirsiyên Sûdana Başûr

Ateny metirsiya Sûdana Başûr li ser bêewlehiya zêdebûyî li zeviya petrolê anî ziman û tekez kir ku welatê wî her tim daxwaza çareseriyek aştiyane û dîplomatîk kiriye, bêyî ku hûrgiliyên din li ser naveroka nivîsê eşkere bike.

Ateny zelal kir ku Serokê Sûdana Başûr Salva Kiir piştî ku bi serokên her du aliyên şer ên li Sûdanê, serokê artêşa Sûdanê Abdel Fattah el-Burhan û Mohamed Hamdan Dagalo (Hemedti) re têkilî danî, gihîşt rêkeftinê û ji wan xwest ku şerê li dora zeviyê rawestînin. Tekez kir ku her du alî jî karin zeviya petrol wêran bikin, lê dema ku şer destpê dike, ew nikarin rewşê rawestînin.

Di derbarê xebata li zeviyê, Ateny piştrast kir ku hilberîn bênavber berdewam dike û tu raporên zirara ku dikare hilberînê rawestîne tune ne. Zeviya Heglig rojane di navbera 40,000 û 80,000 bermîl petrola xam a Sûdanê de hildiberîne, lê hilberîn ji destpêka şer ve bi qasî 20,000 heta 25,000 bermîl petrola ku di zeviyê de tê hilberandin kêm bûye, ji ber girtina gelek bîran û zirara ku gihaşt binesaziyê. Zevî di heman demê de wekî avahiyeke hilberandinê ji bo petrola xam a Sûdana Başûr berî hinardekirinê jî kar dike. Enerjiya wê ya hilberandinê rojane dighaşt dora 130,000 bermîl petrola xam ku ji Sûdana Başûr dihat.

Dema ku Sûdana Başûr di sala 2011'an de ji hev veqetiya, ji sedî 75'ê rezervên petrolê yên Sûdanê bi dest xist. Zeviya petrolê ya Heglig hîn jî di navbera her du welatan de xalek nakokiyê ye.


Cuba hinardekirina petrola xwe bi rêya PortSudan xwe dispêre binesaziya Sûdanê, ji ber ku deryayî wê tune ye.

Piştî revîna leşkerên artêşa Sûdanê, Hêzên Piştgiriya Bilez ragihandin ku wan herêma Heglig kontrol kir. Peymana sêalî piştî danûstandinên di navbera Burhan û Salva Kiir de pêk hat da ku vekişîna hêzên artêşa Sûdanê hêsan bikin û valakirineke ewle ya karkeran misoger bikin, da ku dûrî pevçûnên leşkerî bikevin dê bibe sedema hilwişandina avahiyên petrol li Heglig.

### Ziyanên Girîng

Peyman vekişîna hêzan ji herêma zeviya petrolê ber bi herêmên derdorê ve destnîşan dike, lê di heman demê de artêşê qedexe dike ku li herêmên derdora hilberîna petrolê tu çalakiyek leşkerî li dijî wan bike. Rawestandina xebata li Heglig ziyanên girîng ji bo Başûrê Sûdanê dike, ku bi qasî 95% xwedispêre dahata petrol ku bi rêya benderên Sûdanê tê hilberandin û hinardekirin. Di heman demê de tê wateya ku Sûdan dê rojane 28,000 bermîl petrola xam winda bike, ji bilî xercên transîtê yên petrola Başûrê Sûdanê ku salane bi qasî 400 mîlyon dolar tê texmîn kirin.

Di destpêka Îlûnê de, Wezareta Enerjî û Petrolê ya Sûdanê perspektîf ji bo kampaniyên ku li herêma Heglig dixebitin derxist, da ku plana xwe ya girtina awarte çalak bikin û ji bo derxistina karmendên xwe hevrêz bikin, da rê bigrin li ber êrişeke muhtemel a Hêzên Piştgiriya Lezgîn bin.



### Sektora Petrolê

Wezîrê berê yê Enerjî û Madenê, Adel Îbrahîm, ji ajnsan re gotibû, "Heta ku çek bêdeng nebin û ev şer neyê rawestandin, ji bo sektora petrolê ya li Sûdanê tu hêvî û pêşeroj tune ye." Lê zêde kir, "Hilweşîna sektorê di roja yekem a şerê li welêt de dest pê kir", û got ku "Heglig di bin gefên domdar de bû, heta berî ku şer bighêje nava zeviyên petrol herwiha hêviya xwe anî ziman ku aliyên şer dê pabend bibin ku ewlehiya avahiyan biparêzin û pêşî li cemidandina petrola xam di nav boriyan de bigirin.

Pisporê leşkerî Mutasim Ebdul Qadir yê teqawîtbûyî îhtîmala peymanek dualî di navbera hikûmeta Sûdana Başûr û Hêzên Piştgiriya Lezgîn de ji bo vekişîna hêzên petrolê yên Heglig; dûr nexist, û got, "Ev nayê wê wateyê ku di navbera Salva Kiir, Burhan û Hemedti de peymanek heye." Lê zêde kir ku serokê artêşa Sûdanê Ebdul Fettah El Burhan Hemedti nas nake û berî niha ew wekî çekdarek li dijî artêşê bi nav kiriye, ku li dijî wê şerên leşkerî dike.

Ebdel Qadir zelal kir ku lihevkirinên di navbera hikûmetên Sûdan û Sûdana Başûr de hatine kirin, çalakkirina peymanek berê vedihewîne diyar dike ku di rewşên awarte û pêwîst dê di navbera wan de hevrêzî bê kirin, ji bo ewlekirina avahiyên petrolê ku bi hevsengiya hêzên ji her du welatan pêk were, wekî ku vê dawiyê li Heglig qewimî.

Li gorî vê yekê, hêzên Sûdana Başûr mudaxele kirin da ku herêmê ewle bikin, piştî êrişa dawî ya Hêzên Piştgiriya Lezgîn li ser artêşa Sûdanê, ku paşê neçar man ku ji derdora zeviyên petrolê vekişin.

# Cîhan û Nazim artêşa heqîqetê

**Ekrem Berekat**

Di serdemekê de ku qadên şer bi qadên hişyariyê ve girêdayî ne, di heman demê de hêza hewayî bi hêza gortinê ve hevseng e, raghandina azad weke xeta parastinê ya yekemîn ji bo rastî û bîrdanka gelan radibe. Di şerê ku li derdora Bendava Tişrînê de diqewimî, rûbirûbûn ne tenê bi çek û leşkeran ve sînordar bû; lê berfireh bû heta ku bû şerekî vegotin û çîrok, makîneya dagirkeriya Tirk hewil da ku wêneya xwe ya çewt li ser cîhanê ferz bike. Di navbera dengê bombebaranê û prpogandayê de, du dengên azad derketin holê: Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan, ku kamîreya xwe wekî tifingan bikar anîn û bi hêzeke ne kêmtir ji ya şervanan li hemberî propogandaya çewt sekinîn.

Di dema şer de wan wateya raghandinê ji nû ve pênase kirin, dema ku kamîreya wan bû şahid, parêzvan û leşker û dema ku bi saya wan rastî bû astengiyeke neguhêzbar. Bi saya berxwedana wan a raghandinê a wêrek, pêlek ji gel ya bi hêz berê xwe dan Bendava Tişrînê ji bo parastina wê bikin û piştrast kir ku hişmendiya azad dikare serhildanek ne kêmtir ji dengvedana topan bi hêz pêxîne. Ji vir ve çîrok destpê kir.. çîroka raghandina ku berxwed dide, gelek serhildan dike û du şehîdên ku bi xwîna xwe bîrdaneke nayê vemirandin xêz kirin.

Ji dema hilwişîna rêjîma Baas'ê, Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê veghurî qadeke pevçûnê ku dewleta Tirk a dagirker dixwest di rêya wê de hebûna xwe ya leşkerî, siyasî û raghandinê li ser herêma Bakur û Rojhlatê Sûriyê ferz bike. Ev her du xalên istratîjîk weke kilîta dergeheke berfireh ber bi dagirkirina herêmê bi giştî; dît, ji ber vê yekê hemû hêza xwe ya leşkerî û mekenîzmayên propogandayê di heman demê de balafir û topan bi kar anî.

Di demekê de ku gelê Sûriyê bidawîbûna serdemeke tarî pêşwazî dikirin, dagirkeriyê êrişên xwe yên hewayî û keşfê berfireh dikir, berê pisporên xwe yên raghandinê da aliyê rojava yê bendavê, bi hewildaneke ku çîrokeke serkeftinê ya çêkirî biafirîne ku bi rêya kanal, malper û ajansên alîgirên wê dihat belavkirin. Xwest wêneya binkeftin û kontrolê tesbît bike, di dema ku agirê bombebaranê dihişt ku nîzîkbûna ji rojhilatê bendava Tişrînê û pira Qereqozaqê ne gengaze bû. Lê vîna raghandina azad ji dûmana ku ji ava Firatê bilind dibû berxwedêrtir bû, her du rojnamevan Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan bi awayekî serkeftî gihaştin bendavê, li dijî xeteriya balafirên keşfê sekinîn, da ku bibin şahid, belgeker û redkerên çîroka dagirkeriyê.



**Beerxwedana leşkerî… Berxwedana raghandinê**

Li Tişrînê, ne tenê qehrmaniya çekê hat nivîsandin. Hêzên Sûriya Demokratîk û şervanên Yekîniyên Parastina Jin, bi çekên xwe yên sivik, li hember duyemîn hêza artêşa NATO'yê senikîn. Wan înîsiyatîf ji makîneya leşkerî ya bi çekên giran sitendin. Lê berxwedan du alî bû: li meydanê û di hişmendiyê de.

Cîhan û Nazim pira ku di rêya wê heqîqet derbasî cîhanê bû. di 14'ê kanûna 2024'an de, dema ku medyaya Tirkiyê pîrozbahiya dagirkirina qaşo ya bendavê dikir, kamerayên hevalên me rasterast li jorê wê xuya bûn, di nava çalakiya balafirên keşfê, da ku wê çîrokê ji holê rakin. Tenê piştî pênc rojan, bi êrişeke nû ji sê cihan destpê kir bi tank, wesayetên zirxî û balafirê, dagirkeriyê hemleya xwe ya raghandinê ya berfireh destpê kir ji bo tesbîtkirina wêneya serkeftinê; lêbelê, dîmenên Cîhan û Nazim tam berovajî vê yekê eşkere kirin: alavên wêrankirî, vekişînek bilez û tankek ku ji hêla çeteyên reviyayî ve hatiye terikandin.

**Berxwedana medyayî rê li ber serhildaneke gel vedike**

Berxwedana Nazim û Cîhan ne tenê eşkerekirina heqîqetê bû, lê belê şewoqeke ku hişmendiya gelekê pêxist. Wê şopandinê rê vekir li ber bi deh hezaran şêniyên li herêmê vekir ku li dora parastina Bendava Tişrînê bicivin, wekî xeta jiyanê, sembola berxwedanê û xeta sor li dijî armancên dagirkeriyê biparêzin. Bi vî awayî, wêne û gotin bûn îfadeyek bihêz a îradeya gel û şopandina medyayê veguherî hêzek gelêrî a bihêz ku li dijî her hewldanên çavtirsandinê an jî ferzkirina vegotinên şaş derket.

**Raghandina azad.. Dema ku vedghure artêşa heqîqetê**

Cîhan û Nazim ne tenê peyamnêrên bûyeran bûn. Ew şervanên ji cureyekî cuda bûn; wan kamere bi heman israra kesekî ku tifingek hildigire, hildigirtin. Li hember makîneya raghandina çewt sekinîn, nimûneyeke bê hempa ya rojnamegerê ku hişmedniyê diparêze weke ku şervan xakê diparîze; pêşkêş kirin. Şerê raghandinê ya dagirekriyê têkbirin, wekî çawa ku şervanan êrişên bendavê têk birin.

Heta dema dawî xebata xwe berdewam kirin, bi israreke mîna serhildana Firatê li dijî dagirkeran. Di 19'ê kanûnê de. Li ser riya ku dighêhe di navbera Bendava Tişrîn û Sirînê, ew ji aliyê droneke Tirk ve hatin kemînkirin; ew şehîd bûn, tevlî refên raghandina azad bûn: Mezlûm Dogan, Xelîl Dag, Xirbetlî Arsoz Mustefa Mihemd, Rizgar Dinîz, Dilşan Ibiş, Hogir Mihemed, Sead Ehmed û Îsam Ebdellah.. Karawneke ku bi xwîna xwe bîrdanka gelan û dengê azad xêz kirin.

**Neynika sîstema demokratîk û bîrdanka gelan**

Şehadeta Nazim û Cîhan delîleke nû ye ku raghandina azad ne tenê saziyeke nûçeyan e, lê belê xeta parastina mirovahî û demokratîk e li dijî raghandinê desthilatdarî, kapîtalîzim û dagirkeriyê ye. Ji destpêka ku Mezlûm Dogan ev rê di hundirê zindana Amedê sala 1982'an danî, raghandina azad ji bo pêkhateyên herêmê bû neynika raghandina azad tevahî: Kurd, Ereb, Suriyan, Ermen, Tirkman û Şerkes. Neynike ku xeyalên gelan ber bi edaletê û bîrdanaka wê ya komî ji hewildanên tepisandin misoger dike; nîşan dike.

Xwîna Cîhan û Nazim ne tenê maska dewleta Tirk xist, lê rasatiya gotina azad xurt kir, dema ku bi rûmet tê nivîsandin, ew dibe çekek ku bi qasî topekê ne kêmtire û vediguhere kelehekê ku hişmendiyê diparêze û îsbat dike ku bîra kolektîf nikare were têkbirin çi qas hemleyên derewîn mezin bibin jî.

# Rizgar Denîz bi îradeyeke ji pola da ser şopa heqîqetê

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**"Heya ji min were ez ê xwe biparêzim, lê ji bo vî gelî û ragihandina Kurdî wêneyek jî bê ku rewşê bide guhertin, bêyî ku ez bifikirim ez ê canê xwe li ser deynim." Bi van gotinan şehîd Rizgar Adanmiş (Rizgar Denîz) xwediyê pênûsa zêrîn, tîpên zelal, jiyaneke bi êş û berxwedan, da pey şopa heqîqetê.**

8 sal li ser şehadeta rojnamevan Rizgar Denîz re derbas bû. Şehîd Rizgar Denîz bi îradeyeke ji pola da ser şopa heqîqetê û bi pênûs û kameraya xwe bû dengê rastiyê.

"Heya ji min were ez ê xwe biparêzim, lê ji bo vî gelî û ragihandina kurdî wêneyek jî bê ku rewşê bide guhertin, bêyî ku ez bifikirim ez ê canê xwe li ser deynim." Bi van gotinan Rizgar Adanmiş (Rizgar Denîz) xwediyê pênûsa zêrîn, tîpên zelal û jiyaneke bi êş û berxwedan, da pey şopa heqîqetê.

Her gotineke wî bîrdoziyek û giyaneke neteweyî bû, bi qasî ku ji welatê xwe hez dikir, ew qas jî ji jiyanê hez dikir. Her tim rûken bû û derdora xwe xweş dikir. Bi hevalan re dilsoz bû û di kar de cidî û jêhatî bû.

Rizgar di 12'ê Cotmeha 2017'an de dema bi hawara koçberên ku ji ber faşîzma DAIŞ'ê direviyan diçû, di encama teqîneke hovane de giranî birîndar bû û di 18'ê Kanûna heman salê de tev li karwanê şehîdan bû.

Rizgar di temenê zarokatî de ji ber zilm û zora dewleta Tirk ji bajarê Sêrtê ku ji dayik bû, derdikeve. Ber bi başûrê Kurdistanê û Wargeha Penaberan a Rustem Cûdî (Mexmûr) ve dibe penaberê li ser axa xwe û ji Şengal heya Rojava mohra xwe li şoreşê dixe û xebateke tijî û dagirkirî dide meşandin.

Rizgar Denîz di sala 2013'an de xwendina xwe ya beşa çapemeniyê li Zanîngeha Selaheddîn a bajarê Hewlêrê bi dawî dike û li wargeha Mexmûrê rojnamevaniyê dike. Rizgar ji bo pêşketinê bi demê re di nava pêşbirkê de bû. Her tim di kar û xebatên xwe de hewl dida gelê Kurd ber bi serkeftinê ve bibe û dîroka biêş a nehatiye nivîsîn, bixe nava pelên dîrokê.

Rêwitiya jiyanê ya Rizgar Denîz di 19'ê Sibata 1991'an li bajarê Sêrtê yê herêma Botanê ya Bakurê Kurdistanê ku çavê xwe li jiyanê vedike, dest pê dike. Rizgar di nava malbateke welatparêz de ku ji 7 kesan pêk tê, mezin dibe.

Malbata têkoşer Rizgar Denîz, wekî gelek malbatên herêma Botanê rastî hovîtî û zilma dewleta Tirk hat. Di encamê de malbat neçarî koçberiyê hate kirin, koçberî ji Stenbolê heya Enqere, ji Îranê heta Mexmûrê ya başûrê Kurdistanê berdewam dike.

Rizgar piştî ku zanîngeha xwe bi dawî dike, xebatên xwe yên girêdayî ragihandina azad berfireh dike. Li ser vê bingehê berê xwe dide çiyayên Kurdistanê û beşdarî perwerdeya Akademiya Gurbetelî Ersoz a ragihandinê dibe.

Têkoşer Denîz Firat ji bo demekê ji Rizgar dixwaze ku xebatên xwe li rojavayê Kurdistanê bide meşandin. Rizgar bê dudilî berê xwe dide Rojava û wek edîtor û nûçegihan di Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) de dixebite. Rizgar Denîz rojnamevanê erkên zehmet bû, yek ji yekemîn rojnamegerên ku şerê li Rojava û Bakurê Sûriyê dişopand.



Ji pêngavên rizgarkirina Til Hemîs û Til Birakê heya pêngava rizgarkirina Çiyayê Kezwanan û bajarê Girê Spî, her wiha pêngava rizgarkirina bajarokê Holê yê rojhilatê Dêrazorê û herî dawî jî şerên li gundewarên Dêrazorê bi pênûs û kameraya xwe berxwedana şervanên YPG û YPJ'ê belge dikir.

Piştî xebateke mezin li Rojava û Bakurê Sûriyeyê di destpêka 2015'an de li Şengalê wek nûçegihanê kanala Çira TV xebitî.

Piştî du salan li Şengalê xebateke mezin da meşandin, di sala 2017'an de ango dema ku QSD'ê şerê rizgarkirina Reqa û Dêrazorê ji çeteyên DAIŞ'ê dabû destpêkirin, dîsa vedigere Rojava û li vir wek xebatkarê Stêrk Tv û nûçegihanê ajansa ANHA'yê karê xwe bi rêk û pêk dimeşîne.

Di 12'ê Cotmehê de dema ku welatiyên sivîl ji ber zilma çeteyan ber bi herêmên rizgarkirî ve yên di bin parastina şervanên QSD'ê ve direviyan, nûçegihanên ANHA'yê Dilîşan Îbiş, Hogir Mihemed û Rizgar Denîz, ji bo rewşa van koçberan bişopînin, berê xwe da Riya Xerafî ya di navbera Dêrazor û Hesekê de. Li vir çeteyên DAIŞ'ê du erebeyên bombebarkirî teqandin. Di encama teqînê de nûçegihanên ANHA'yê Dilîşan Îbiş û Hogir Mihemed şehîd bûn û Rizgar Denîz bi giranî birîndar bû û di 18'ê Kanûna 2017'an de şehîd bû.



# 'Nazim Daştan mîrateyek li pey xwe hişt'

Rojnameger Dogan Cîhan diyar kir ku Nazim Daştan bi xebata xwe, mîrateyek li pey xwe hişt û got, "Nazim Daştan ruhê berxwedanê li Bendava Tişrînê geş kir û hêza çapemeniya azad careke din nîşanî tevahî cîhanê da."

**Viyan Egîd/Hesekê**

Rojnemevan Cîhan Bîlgîn û rojnamevan Nazim Daştan ku di 19'ê Kanûna 2024'an de li ser rêya Bendava Tişrînê-bajarê Sirînê di êrişeke hewayî de ku dewleta Tirk a dagirker li dijî erebeyan wan pêk anî, şehîd bûn. Di çarçoveya jiyan, kar û xebatên şehîd Nazim Daştan de, rêhevalê Nazim Daştan yê ku bi salan bi hevre kar û xebat dane meşandin, Rojnameger Dogan Cîhan ji Rojnameya me re axivî.



**'Nazim weke deryayekî ye'**

Rojnameger Dogan Cîhan di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: "Li Bakurê Kurdistanê di sala 2015'an şûnde dewleta Tirk a dagirker pêvajoya çareserî ya ku Rêber Apo dabû destpêkirin xira kir û li hember Kurdan di çarçoveya "Plana Çokdanînê" êrişên qirkirinê yên sedsalî dest pê kir. Di 24`ê Tîrmeha 2015'an de bi dehan balafiran êrişên Qadên Parastina Medya kir û gelek bajarên Bakurê Kurdistanê şerên rêveberiya xweser destpê kir. Di wan deman de min jî li Ajansa Nûçeyan a Dicleyê nûçegîhantî dikir. Nazim Daştan jî yek ji rojnamegerên bijare ku hem di warê kesayet hem jî di warê pîşeyî de li ber çavan bû dihat naskirin. Ji ber rewşên şer yê li Bakurê Kurdistanê me li heman cih kar û xebat nekir lê Nazim gerek li Dîlok gerek Silopya gerek jî li her cihê ku rojnamegertî dikir li ber çavanbû. Ji ber giraniya şer me nekarî di nava peywendî de bin, lê heval Nazim bi nûçe, dosya, wêne, dîmen û nivîsê xwe ve li ser min gelekî xwedî bandorekî taybet e. Deh sal bû ku min Nazim nas dikir, 4 salên me yên dawî jî hema hema her roj jî bi hevre derbas bû. Ez Nazim tînim bîra xwe Nazim weke deryayekî ye. Ji kudera deryayê ez destpê bikim, dizanim ku wê kêm bimîne lê behsa wî kirin herî kêm du gotin be jî vegotina jî gelekî girîng dibînim.

**'Nazin xweşik didît, xweşik difikirî û xweşik diaxifî'**

Dogan di da zanîn ku hevak Nazim mêyzekirina wî ya jiyanê li ser esasê xweşikbûnê bû û wiha pê de çû: "Nazim ji Agiriyê bû. Ji wê heremê re Serhed dibêjin. Serhedî însanên civakî û germ in. Nazim jî taybetmendiyên civaka Serhedê girtibû û li ser wan jî bi xwesertiya xweşikbûna xwe li ser zêde kiribû. Ji dil dixwazim bibêjim ez şahîdê 4 salên wî yên dawî me: Nazim ji dil bû, xweşik didît, xweşik difikirî û xweşik diaxifî. Di heman demê de kî heval kêmek nerehetba, Nazim wê li ber serê wan ba. Dema însan mêyze kir ji dilê xwe rewşa wan fam dikir. Hevaltiyekî xweş dikir. Mêyze kirina wî ya jiyanê li ser esasê xweşikbûnê bû. Ji xwe re tûrika xweşikbûnê ava kiribû. Ji bo her tiştî xweşik bike tûrikê wî tijî bû. Di vê jiyanê de zehmetî û rojên giran jî dîtibû. Bi zehmetiyan heta roja ku şehîd ket bi tûrika xwe ya xweşikbûnê hat. Însanê ku destê xwe dayê jî para xwe ji wê xweşikbûnê girt. Ji dil, baş, bêhnfireh, famker, zana, kedkar, bi rehm û zîrek bû. Çi kar bikira, rewş çibûya, derfet çawa bûya Nazim heman Nazim bû. Nazimê zana, Nazimê bêhnfireh, Nazimê heybet û xweşik bû. Li ger wî însan pir giranbûha bû. Karê ku dikir pir bi nirx bû, ji ber wî karê xwe ser dixist. Çi kar bûya diket navê û bi awayek xweş karê xwe dikir."

**'Nazim li her cihî bû'**

Dogan Cîhan diyar kir ku hîsên Nazim pir bi hêz bû ku Êş û derdê wî welat û civaka wî bû û wiha domand: "Nazim bi rojên zehmet, di bin zext û zordariya dewleta Tirk a dagirker de bi têkoşîn û berxwedana xwe heta roja xwe ya şehadetê jî hat. Nazim xwe di her kêlî de neda baş, Nazim çi êriş li ser çibû jî, birîndar bû, êrişê wî kirin, hat girtin, hakaret lê hat kirin, zexta dêrûnê lê kirin, bê pere ma, bê war ma lê ew di her kêliya ku hêdî însan bifetise jî Nazim derfeteke piçûk ya nefes girtinê peyda kir. Bêhnek kişand. Xwe çêkir, xwe di nava zehmetiyan dexwe avakir. Nazim zarokê vî welatê bû. Ciwanekî ku rastiya welatê xwe û civaka xwe di temenên xwe yên piçûk de ferq kiribû û ji zanîngehê berê xwe dabû rojnamegeriya azad ku ji bo welat û civaka xwe sudemend be. Jiyanekî ku dikarî ji her tiştî dûr, ji heqîqet dûr di nava derawan de jiyan bike, lê Nazim ne ji wan kesan ne ku ji rastiyan dûr bijî. Helebê berxwedanî çêbû Nazim li wir bû, Kobanê êriş çêbû Nazim li wir bû, Silopya berxwedanî destpêkir Nazim li wir bû, li Minbic şerekî dijwar destpêkir Nazim berê xwe da wir, Reqqa şerê tola sedsalê hat jiyîn Nazim li wir di nava xwînê de ma birîndar bû. Hîsên Nazim pir bi hêz bû. Êşa wî derdê wî welat û civak bû. Her çîroka ku ji me re ragihand, her wêneya ku nexş kir, her dîmenê ku qeyd kir, ji me re behsa welat û civak kir."

**'Analîzên Nazim li ser rewşê pir xurt bû'**

Dogan Cîhan destnîşan kir ku heval nazin dinazî bû ku wê şerekê dijwar li Sûriyê çêbibe û wiha got: "Meha cotmehê bû min bi heval Nazim re xwarin çêdikir. Wê demê em li Hesekê bûn. Li Helep liv û tevgerekî nediyar destpêkiribû. Nazim ji ber berê jî li Helebê mabû pir bala wî dikişand û bi xwe digot ev tiştek nenormal e. Bi ev rewş zêde serê xwe diêşand. Çend roj derbas bû got, "Şerekî dijwar wê li Suriye biqewime. Wê ev rewşa Suriye de guhertin çêbe. Gere em wek ragihandina azad rewşê pir baş analîz bikin, karibin baş bişopînin, ji ber ku guhertina vî rewşî aliyekî jî Kurd in." di derbarê hatina şer de tiştek negotibû û nehatibû eşeke kirin wê çi çêbibe, lê heval Nazim bi xwendin û dîtina hatina rewşê vegot. Li Suriyê alozî û şer destpê kir. Nazim ji ber ku qadê pir baş nasdikir berê xwe da Minbic. Salek derbasbû wek niha wan kêliyan tê bîra min ewqas zehmet bû ku kes nezanî çend deqeyên din wê çi bibe, lê Nazim ji ber giraniya pêvajo û esas de jî di giraniya dîrokê de bû, çû Minbicê. Nazim di karê rojnamegerî û propaganda de di warê pîşeyî de dizanîbû ev pêvajo li ser ragihandinê tê meşandin. Ji ber wê bûyîna li qadê yekser pir giringî dida. Nazim çentê xwe girt û di nava wê taritî, nezelalî de çû Minbicê. Em hemû jî şahîdin niha jî mirov dikare li ser înternetê nûçe û dosyayên ku Nazim hem ji Minbîc, Pira Qereqozaxê û hem jî li Bendava Tişrînê peyda bike, dewleta Tirkiye çi digot, Nazim bi dîmen, wêne, çîrok, nûçe, dosya esas bi belgeyên wan vala derdixist."

**'Nazim û Cîhan di nava qiyametê de karê xwe kirin'**

Dogan di dewamiya axaftina xwe de wiha got: "Ew kêliyên min bi heval Nazim re derbas kirin, nayên ji bîr kirin, ji ber ku me bi kêlî kêlî rewş dişopand. Tirkiye û SMO got em ketin Minbîcê. Nazim ji nav sûka Minbicê derket û got "Em kesî nabînin", ev bû dîrok. Dîsa hemû cîhan rewşa Bendava Tişrînê dişopand. Çend roj berê ku têkoşîn û berxwedan destpê bike, kesî nezanî bû ku Bendava Tişrîn li kuderê ye, Tişrîn çi ye. Lê Nazim bi hevala xwe Cîhan Bilgîn re di nava qiyametê berê xwe dan Tişrînê, ji hemû cîhanê re rewşa Tişrînê ragihand. Ew dem dinya alem fam kirin ku li wir şerekî dijwar diqewime. Her kesî fam kir ku Tişrîn li kuderê ye, giringiya wî çi ye, wate xwe ji bo gelê Kurd û Ereb çi ye, ev bi saya Nazim û Cîhan çêbû. Piştre ji xwe ev pêvajoya ku berxwedaniyek dîrokî li Tişrînê pêşket gelê Kurd Ereb û tevahî pêkhateyên li heremê berê xwe da Tişrînê. Ev bi saya berhemên Nazim û Cîhan çêbû. Girîngiya rola ragihandinê li vir derdikeve holê ku civakê çawa araste dike, civakê dike tevgerê. Ev Nazim bi keda xwe kir. Bi zanebûna xwe ya ragihandinê kir. Nazim û Cîhan di nava qiyametê de karê xwe kirin. Bûn dengek ku îro li ser berxwedaniya Tişrîn hatiye nivîsandin ku cîhan pê hesiyaye."

**'Şehadeta Nazim û Cîhan wek wendahiyek min nivîsandiye'**

Rojnameger Dogan Cîhan di dawiya axaftina xwe de xwe anî ziman: "Civaka me û bi taybet gelê me sedsalên dawî di bi peymanên taybet ve hatin parçekirin, li ser civaka me konseptên qirkirinê dan destpêkirin. Dewleta Tirkiyê, di çarçoveya tunebûna Kurdan dewleta xwe çêkir, hîn jî ev di esas de dimeşîne. Yek armanc heye tunebûna Kurd e ye. Li hemberî vê yekê hebûna xwe, hebûna welat, civak, gel, rastî, warê xwe û bi giştî têkoşîn, berxwedan, şerê gelê xwe bi belge radigîhîne. Ev ji bo dewleta Tirkiyê sûcê herî giran ku nayê efûkirine. Dema li hember kiryarên dewleta Tirkiyê tu belgeyek eşkere bike êdî tu dibe hedefa wan. Dewleta Tirk bi hedefgirtina Nazim û Cîhan; rastiyên gelê me, têkoşîn, berxwedan û rastiya warê me hedef girtin. Erka me ye ku pêwîst e em hevalên wan an hempîşeyên wan ev tişt ji herkesî re ragihînin. Bidin fam kirin. Nazim û Cîhan li dewerên ku êriş hebûn wek Minbic, Pira Qereqozaxê û Bendava Tişrînê hebûna Kurd û lihevkirina gelan ragihand ku li wir hebûna Kurdan bûye lihevkirina gelan û ew jî bûye berxwedanî, ev berxwedanî jî êrişên dewleta Tirk şikand. Civak ev dibîne, dinya alem dibîne. Ev feraset çêdike, kesayet çêdike, ev têkoşîn û berxwedanî ava dike. Dewleta Tirk nekarî tahammul bike. Ji xwe sînor û pîvanên şer gel wan nîne. Di 19`ê Kanûna 2024`an Nazim û Cîhan hedef girtin.

Şehadeta Nazim û Cîhan, ji bo me pir giran bû. Min bi xwe ev rewş di jiyana xwe de wek wendahiyek nivîsandiye. Me hem du rojnamegerên pir bijarte, jêhatî hem du însanên pir hêja, hem jî du ciwanên ku ji bo vî welatî hîna pir xizmet bike me wenda kir. Nazim û Cîhan dema kar dikirin jî û bi şehadeta xwe jî mîrateyek hişt. Ew mîrate hêza çapemeniya azad carekî dîtir nîşanê dinya alemê da."



# Platforma Şiyar Be; Hişyarîkirina civakê ji Şerê Taybet ê tiryakê ye

Berdevkê Platforma Şiyar Be ya Wanê Ercan Erkol diyar kir ku li Bakurê Kurdistanê pergal û derdorên tarî yên ku ji pergalê re xizmetê dikin, bi zanebûn civakê dikin hedefa Şerê Taybet ku madeyên hişbir zêde dikin û belav dikin, ji bo pêşîgirtina vê yekê wan Platforma Şiyar Be daye destpêkirin û got, "Dawîbûna platformê ser çareserkirina pirsgirêkê ye."

**Ronahî Sadûn**

Li cîhanê sal bi sal belavkirin û bikaranîna tiryakê zêde dibe. Li gorî rapora Ofisa Sûc û Tiryakê ya Neteweyên Yekbûyî (UNODC), di sala 2023'an de li tevahiya cîhanê nêzî 39,5 milyon mirov êdî bûne tiryakê madeyên hişbirê. Di salên dawî de herî zêde hişbira metamfetamin û fentanil ku wekî madeyên sentetik tê pênasekirin zû belav dibe. Li gorî rapora Navenda Şopandina Tiryakê ya Tirkiyê jî (TUBİM) di sala 2024'an de nêzî 300 mirov bi tiryakê mirin, herî zêde mirovên di navbera 30 û 40 salî de bi tiryakê mirine û ji sedî 92,3 mêr in. Di heman demê de di salên dawî de li bajarên ku kurd lê dijîn û koçberî lê pêş ketiye jî, tiryak zêde bûye. Wekî Mêrsîn, Edene, Dîlok, Riha, Wan, Amed, Şirnex û Semsûr, li van deveran bi zanebûn şerê taybet tê meşandin û madeyên tiryakê tên belavkirin, li dijî vê yekê jî tedbîr nayên girtin. Êdî li van bajaran di nava rojê de madeyên hişbir tên firotin.



**Tiryakê jehra ku civakê dihelîne**

Elimandina maddeyên tiryakê ne tenê bandorê li tenduristiya fîzyolojîk an jî psîkolojîk a kesan dike, ev pirsgirêka jehreke berbelave ku siberoj, exlaq û nasnameya civakê belav dike û dihelîne. Ji ber vê yekê kesê ku bi tiryakê ve tên girêdan, dibin amûrek bê hêz û bi hêsanî tê beralîkirin. Sîstema kapîtalîst tiryakê weke çek bikar tîne, ji bo ku civakê ji nirxên exlaqî qut bike û bike civakeke bê vîn bide avakirin. Bi taybetî jî ji bo bikaranîna vê jehrê ciwanan dike hedef û vê tiryakê belav dike. Di heman demê de kesên tiryakê bikar tînin, bandora neyînî li ser malbatên wan jî dike. Ji ber armanca kesên ku tiryakê belav dikin ew e ku civakê parçe bikin. Stratejî û polîtîkaya serdestan şikandin û ji hev ketina civakê ye. Tiryak û fihûş civakê dirizîne.

**Hişyarîkirina civakê ji şerê taybet**

Ji bo hişyarîkirin û rêxistinkirina civakê li Bakurê Kurdistanê Platforma "Şiyar Be" hatiye destpêkirin. Armanca vê Platforma ku li ser nirxên demokratîk hatiye avakirin, di bingehê xwe de têkoşîna li dijî tiryaka ku civak xistiye nava tora xwe û wê bênefes dihêle ye. Armanc dike ku li dijî vê tora tiryakê, civakê hişyar bike û wê bixe ferqa bikaranîna tiryakê de. Li ser vê bingehê di çarçoveya platformê de gelek çalakî ji belvkirina biroşûr, civîn, daxuyanî, hişyarî û hwd… hatine lidarxistin.

**Çarserkirina pirsgirêka fihûş û tiryakê**

Çareserkirina van pirsgirêkan ji hişmendiya takekesî wêdetir, birêxistinkirina civakî pêwîst dike ku civak li ser nirxekî exlaqî û polîtîk were avakirin, da ku ew bi xwe rê li pêşiya şerê taybet ê ku di nava xwe de gelek jehran digire û bilav dike ku yek ji wan jî tiryake bidawî bike. Civaka rêxistinkirî civaka zana ye, ji bo wê ya girîng rêxistinbûyîne.

Derbarê belavbûna tiryakê li Bakurê Kurdistanê û zêdebûna fihoşê, herwiha Platforma Şiyar be ku li dijî tiryakê hatiye destpêkirin, Berdevkê Platforma Şiyar be ya Wanê Ercan Erkol ji Rojnameya me re axivî.

**'Di çarçoveya xebatên platformê de nêzî 25 sazî, rêxistin û partî hatin ziyartkirin'**

Ercan Erkol diyar kir ku platforma Şiyar be ji nêzî 15 sazî, rêxistin û partiyan pêk tê û wiha got: "Platforma Şîyar be Wan ev nêzî 2 mehane dest bi xebatên deklere ya platformê dike. Platform nêzî 15 sazî, rêxistin û partiyên siyasî pek tê. Di navbera 2 mehan de, derdora 20 û 25 sazî, rêxistin û partiyên siyasî hatine ziyaretkirin. Herwiha di nava gel de xebatên belevok belavkirin ji bo deklere yê hatin kirin. Di 6'ê ve mehê de ango Şemîyê jî bi teflîbûna 100'an meşek pêk hat û deklere ya platformê hat ragihandin."

**'Dawîbûna platformê ser çaresergirina pirsgirêkê ye'**

Erkol di berdewamiya axaftina xwe de armanca platforêmê wiha anî ziman: "Armanca platformê ew e ku pêşiya belavbûna madeyên hişbir û girêdayî madeyên hişbir fihûşa zêde dibe, bigre. Dawîbûna platformê jî ser çaresergirina pirsgirêkê ye. Sedemên belavbûna madeyên hişbir û girêdayî we zêdebûna fihûşê, girêdayî şerê teybete. Pergal û kes û derdorên tarî yên ku ji pergalê re xizmetê dikin, bi zanebûn civakê dikin hedef, teybet jî ciwanên welatparêz dikin hedef, girêdayî vî şerî xizanî jî heye û mixabin ser vê xizanî ye, ciwan dikevin lîstika pergalê û van kesan.

**'Pêwîst e zarokên vî gelî ser exlaq û çanda xwe mezin bibin'**

Ercan Erkol axaftina xwe wiha qedand: "Pergal raste rast malbat û ciwanên welatparêz dike hedef. Armanc ew e ku ciwan û civak dûrî rêxistin, çand û nirxên xwe bi kev in. Civakek bê hiş û bê vîn bidin avakirin. Mixabin piştî sûreca 2013'an û destpêkirana şerê 2015'an li ser civakê tirs hate belavkirin, kuştina kesên medenî û dîsa girtina welatparêzan ev tirs dan avakirin. Civak jê bandor bû û pêşiya zarokên xwe girtin ku neyine girtin, ciwan ji rêxistinê dûr ketin. Ciwanên ji rêxistinê dûr ketin, mixabin rêxistinbûyîna xwe jî winda kirin. Vê yekê pêşiya pergalê vekir ku gelek ciwan bi hêsanî ketin bin bandora pergalê û derdorên tarî. Ji bo ku pêşiya vê were girtin, hewceyî ciwantîyek û civakek rêxistinbûyî heye. Li hember şerê teybet, yekane çareserî xwe rêxistinbûyîne. Malbat bila pêşiya zaroken xwe negirên ku dûrî rêxistina xwe ne kevin. Hewceyî heye ku zarokên vî gelî ser exlaq û çanda xwe mezin bibin. Ji ber vî gelî êşên pir giran kişandin û bedelê pir mezin dan ku ev exlaq û çand neyê tune kirin. Bi van hêstan em wek platforma Şîyar be Wan piştgiriya tevahî malbatên welatparêz dixwazin. Piştgiriyek xurt a gelê me wê têkoşîna platformê ser bixîne."

## Dîzayn û çarenûs



**Farûk Sakik**

Li pêşiya azadiya Kurdan hin dînamîk hebûn ku ji sed salî zêdetir e dibin asteng. Kurd di nav xwe de ji bo nasnameya xwe biparêzin gelek hewldanên wan hebûn. Parastin jî. Lê azadiya welatê wan her tim dibin xeteriyê de bû.
Li hemberî wan dînamîkên ji derve ku midaxaleyî azadiya wan dikirin Tevgera Azadiyê-PKK ket dewrê. Ew tiştê ku ne mimkun bû anî astek û ew sîstem berteraf kir.
Dema li serhildanên berê dinêrin bi tenî bi dewleta dagirker re hatî şerkirin. Li dijî dînamîkên derve(Fransa, Brîtanya, Rusya) yên di şerê cîhanê yekem û Lozanê de tu tiştek nehatî kirin.
Lê Tevgera Azadiyê di vê serhildana dawî de li aliyek li dijî dewleta Tirk li aliyek jî li dijî hêz-polîtîkayên NATO şer dikir.
Rêber Apo di axaftineke xwe ya pêvajoya aştî civaka demokratîk de dema behsa temamkirin an jî derbasbûna merheleyeke nû ya Tevgera Azadiyê dikir, digot; Me hebûna Kurdan da qebûl kirin. Hem bi Kurdan û hem jî bi dînamîkên li pêşiya azadiya Kurdan astengbûn da qebûlkirin.
Dema Kurd derbasî qonaxeke nû dibin, ji derve dîsa midaxele heye. Ev yek bi taybetî em li herêma Rojavayê Kurdistanê dibînin.
Piştî Şerê Cîhanê çawa anatolya li gor siyaseta xwe dîzayn dikirin, îro jî dixwazin qedera Rojavayê Kurdistan wisa dîzayn bikin. Wê demê bakurê Kurdistanê dibin dagirkeriya Îngiliz, Fransa, Îtalya de bû. Li ser axa Kurdan bi dewleta Tirk re bazarî kirin. Lihevkirin. Sînorê Bakurê Kurdistan yê îro ji Tirkan re hiştin. Dema bi peymana Lozanê vekişiyan bedela vê vekişandinê de bi navê Iraq û Sûriye 2 dewlet avakirin. Başûrê Kurdistan ji Îngilizan re û Rojava jî ji Fransiyan re hiştin. Belê li ser dabeşkirina axa Kurdistan li hev kiribûn.
Sal derbas bûn ev herdu dewlet ji herêmê vekişiyan lê mafê Kurdan, radestî Kurdan nekirin. Ax û mafê Kurdan radestî rejîmên Baas kirin. Û va dîsa li Rojhilata Navîn in û dixwazin rejîma Baas birûxînin. Di dewsa rejîma Baas de li gorî xwe ji nû de dîzayn bikin.
Li Başûrê Kurdistanê, Kurdan sîstemek li gorî konjuktura demê bi dest xistin. Altetrnatîfeke nû nedidîtin ku di demsa rejîma Baas de bînin îqtidarê û Iraqê radestî wan bikin. Tirkiye li vê derê hinek xwe biranî lê dema ku çiwal xistin serê eskerê wan, pissst bûn.
Ji vê tecrûbeyê ye Tirkiye dixwaze Kurd li Rojava nebin xwedî statu. Di vê hewldanên xwe de jî bi ser dikevin. Di dewsa rejîma Baas de HTŞ'a ku hatî desthilata Sûrî di bin bandora zextên Tirkiyê de dimîne û ji bo aramiya Sûrî tu gavek navêje.
Di 10'ê Adarê de dema di navbera Mazlum Ebdî û Ahmed El Şeraa de peyman hat îmzekirin, 8 xalên maqûl di vê peymanê hebûn. Lê Tirkiye ket dewrê û nehişt Şam yek gav bavêje û li gor vê peymanê tevbigere (Tirkiye ji bo bandor li civakê bike, dibê; aliyê Kurdan li gorî peymanê tevnagerin).
Sedemek êrişên Tirkiyê yên li dijî rêveberiya xweser ev e; pêvajoya ku nû dest pê kiriye, aliyê Tevgera Azadiyê ji bo aştiyê hemû gav avêt. Herkes li bendê ye dewlet jî berpisyariya xwe bîne cih. Hin gavan bavêje, hin qanûnên nû derxe, di qanûna înfazê de guhertinên nû çêke, da ku Kurd bikaribin tevlî Pêngava Aştî û Civaka Demokratîk bibin.
Çi hincet nîşan dide? Rêveberiya Xweser ji bo xwe talûke nîşan didin. Dibêjin heta QSD entegreyî artêşa Sûrî nebe,wê gav navêjin. Talûke çi ye jî bi nav nake. Tu kesek jî jê pirs nake.
Tişta herî balkêş jî di hedefa wan de QSD heye. Behsa sîstemê nakin. Dixwazin Kurdan bê ewlekarî bihêlin.

# BI KENÊ ME JIYAN TÊ HÛNANDIN

**Cûdî Cizîr**


Jiyana ji zayîn û mirinê peyda dibe, gelek tişt ji me bir û gelek tişt jî da me. Bi kenê me re ev dergûşa ji gerdûnê re dibe cih û war wê careke din ji dehatiya mirovatiya nû re sînga xwe wê veke. Bêguman kenê me banga azadiyê ye, daxwaza bêsînoriyê ye. Kenê me, tevlî çeman dibe, diherikê li çiyayan asê dibe, li bajaran kom dibe, dibe derya, tav lê dide, jê hilmek hênik bilind dibe. Diçe perdeya asiman diqetîne, dibe ewr, gurmîniyan li jor tîne, baranê dibarîne. Axê şil dike, hêşîn dike. Ev çavkanî, kenê me ye! Bila kes nebêje gaziyên şoreşê êdî nikarin tiştekî bikin, tirêjên me tûj in! Dema em gava xwe diavêjin pir xurt diavêjin. Bila kes nebêje êdî gazîyên têkoşînê nikarin bikenin, Ma kî dikare weke me dilê xwe bike xaniyê stêrkan? Kî dikare deriyê wê malê veke? Tenê kesên bedew, dilsoz, qenc û hevrêyên Apoyî dikarin dilê xwe bikin hêlîna stêrkan.
Bi kenê me re Jiyan xezîneya xwe vedike. Reng û dengê me di navbera lênûs û pênûsê de; hêvî û hestên me di nav helwesta azadiyê de ne. Lewma ken û jiyana gaziyên şoreşê romaneke mezin e. Bi qasî deryayekê fireh e. Kenên me li ser deryayê dûr û kûr diçe, dikeve nava kûrahiya jiyanê. Divê mirov weke evîndarekê bi jiyana azad re bikene û dest ji lêgerînên xwe bernede. Bi kenê me jiyan tê hûnandin. Hêvî û hestên me xweşikî û bedewiyan diafirîne. Ken, gula rû ye. Ken, strana azadiyê ye, baskê şahiyê ye, ji hêlîna dil derdikeve, difire diçe û dirêj dibe.
Kenê me reseniya jiyanê diafirîne. Evîna me, baskê xwe li bayê welêt difirîne. Di nav asimanê şîn re derbad dike. Bi rastî kenê me nîşaneya azadiyê ye. Em ê kenê xwe çawa li ser rûpela spî bineqişînin? Kenê me hêviyeke ku di dilên gelan de hatiye afirandin. Weke çirûskên tîrêjên berbangê xwe berdide ser deşt û çiyayan. Xweza û mirovahiyê bi hemû germahiya xwe hembêz dike. Bi ker kenekî me kulîlk, çiya û deşt; mirovahî, jin, zarok bi germahiya tîrêjên rojê radibin dîlana azadiyê.
Bi taybet kenê gaziyên şoreşê hêviyên vejînê diçîne. Mîna şitleke dara çinarê her roj mezin dibe û li derdora agirê azadiyê difire. Ji lewma kenê gaziyên Kurdistanê dara dinyayê ye. Dîmenên rengîn û xweşik li pişt xwe dihêle. Ken dibe evîn, hêvî azadî û tovên gulan hêşîn dike. Dil dihejîne, nûra çavan dide biriqandin. Bi rastî jî kenê me stêrkên li asîman rohnî dike, di şêvên tarî de pêşiya me ronî dike. Rêya azadiyê nîşan dike. Kenê gazîyên têkoşîna azadîyê; di dil û mejiyê mirovan de evîna azadiyê ji nû ve dide şînkirin Welatê rojê bi vê tevgara nûjen dilerize û zindî dibe. Bi hêviya kênê azadiyê...



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**

Helbestvan Ebîr Direî
"Kaniya ku zuha nabe, û çiraxa ku na vemire"
Rola helbestvan û nivîskarên jin ên Kurd di serdema nûjen de yek ji rolên herî girîng e di pêvajoya wêjeya Kurdî de, ji ber ku ew nûnertiya dengê ku bi dilgermî hest, êş û hêviyên mirovê Kurd vedibêjin û bi gotinên xwe mîras û dîroka gel a tije têkoşîn û bexşîn radigihîn.
Di nav van dengên ronak de helbestvana Kurd Ebîr Dirêî yek ji wan kesên ku pênûs û peyvên xwe ji bo xizmeta gelê xwe û doza wî ya dadperwer terxan kirine, tîp kirine kiryareke xwedîderketin û berxwedanê û helbest kirine menbera azadî û rûmeta gelê Kurd.
Di nav pêmayên sînemaya Amûdê de, ku hê jî helemora laşên şewitî yên zarokan bi xunava sibehê û hêstirên dayikên dilşewat re tevlihev dibin, keçeke kurd mîna kulîlka çolê ku li ser singa zinaran şîn dibe , ji dayik bû; Keçeke ku denge wê rojekê veguhere pizoteka berxwedanê ya ku nayê vemirandin.
Ebîr li Amûdê, dergûşa şaristanî û dîrokê mezin bû, yek ji benderên şaristaniyê yên herî kevnare ku netew lê daketine, û keşwer û çandên kevnar li ser axa wê geş bûne, ew wargehê Mîtaniyan û Sûbariyan bû, ku hebûn û bîranîna xwe di zinarên wê de xêz kirin, paşê ji bo Bedraxaniyan û Botaniyan bû mehrava bîr û raman, ziman û hişmendiya neteweyî.
Li ser vê xaka pîroz, ew keça biçûk hatiye dinyayê,paşê ew bû helbestvan û nivîskar, bi ruhekî afirînerî êş û hêviyên gelê xwe bi riya ramîn û helbestên xwe tomar dike ku layîqê dîroka wê be ,ew helbestvana Kurd Ebîr Dirêî ye, di sala1969'an de ji dayîk û bavek Kurd (Ebdurehman Dirêî û Biroja Hemo), di malbateke kurdperwer kedkar, hunermend, welatparêz de, girêdayî nirxên Kurdî, evîndarê axa welat û dilsozê ziman û mîrateyê ye hatiye dinyayê. Malbatek ku ji sê xwîşk û çar birayan pêk tê, ku hemû jî bi wefadariya nasnameya xwe, dilsoziya welatê xwe û şanaziyê bi mîrata çandî ya Kurdî mezin bûne.
Ebîr ji ruhê Amûdê ava jiyanê vexwar û mezin bû, lewra gotinên wê ji bîranîna wê der tên , û bûye dengek ji dengên wê yên ku navemire.
Wê zarokatiya xwe li taxên Amûdê yên teng derbas kir, ku bêhna nanê tenûrê bi axê şilbûyî bi xunava sibê re tevlihev bû, û ku li wir bayê şopên çîrokên kevn û şûnên bîrdankê hilgirtibû.
Ew bi çîrokên şewat û qehremaniyê yên ku dapîran di şevên sar ên zivistanê de li dora sobeyên daran vedihûnandin, mezin bû, ji ber vê yekê her ku gotin ji devê wan de bi germahî derdiket,di xeyala wê de pêta wan gur dibû.



Ew li ser nebeza çandê ya ku malên bajêr bi stran, pirtûk û çîrokên xwe tije kiribûn, li ser dengê stranên kevneşopî û welatparêzî ên ku dayikan serê sibehê dubare dikirin, û li ser awazên bilûrê ku bavê wê lêdixist, awazeke germ ku weke ruhê bajêr, awazek ku di dilê wê de hestê xweparêziyê şiyar kir û di giyanê wê de hezkirina ziman û mîrateyê çande û hesreta peyvê pêxist ku nayê vemirandin .

Di zarokatiya xwe de, wê gelek bawernameyên rêzgirtinê di warê rewanbêjî , werzîş û hunerî de bidest xistin û wê pileya yekem di warê jîmnastîkê (Cimbazê) de , di gel mertal, madalyayên zêr û kûpayek zîv, li ser asta Sûriyayê wergirt.
Ebîr xwendina xwe ya seretayî û amadeyî li dibistanên Helebê stand , paşê dibistana navîn li Amûdê qedand.
Li bajarê Qamişlo li Peymangeha Mamosteyan xwend, paşê xwendina xwe ya akademîk li Kolêja Perwerdeyê ya Zanîngeha Helebê berdewam kir.
Ew niha li zanîngeha Feratê hiqûqê dixwîne, da ku hevrêzîyekî bike di navbera peyv û terazûyan, helbest û huqûqê de.
Ebîr di temenek piçûk de, bêyî ku kariyera xwe ya perwerdehiyê bide sekinandin, zewicî, ew dayika pênc zarokan e, ku hemû jî xwendekarê zanîngehê ne û îro li Ewropayê dijîn, ew hîn jî li bajarê Amûdê dimîne , bajarê ku jê hez dike û nikare terka wê bike , tevî dijwarî, zehmetî û şert û mercên dijwar ên ku herêm tê re derbas bûye, ew dibêje: "Emê li vir bimîn in, û em ê bajarê xwe neterikînin, û jiyana keyf û xweşiya Ewropayê wê me nexapîne "
Şarezayiya wê ya wêjeyî û hezkirina wê ya ji bo helbest û muzîka kurdî di temenekî biçûk de dest pê kir, di bin bandora jîngeha wêjeyî û çandî ya derdora wê de, ji ber ku ew di malekê de ji dayik bû,ku pirtik (rîş) û bilûr li kêleka hev bûn, û huner jî tê de geş dibû , çawa ku bîranîn li cihên kevnar vedijîn.
Ew gelekî bandor bûye ji bavê xwe yê hunermend Ebdulrehman Direî û hevalên wî yên rewşenbîr, herwiha helbestvanê nemir Hemîd Bedraxan jî di serdana xwe ya gelek caran de li mala malbata wê şopeke zelal li ser giyanê wê hiştiye .
Ev giyan xwedan meylek helbestî ya sûfî ye ku ji hezkirina wê ya ji helbestên Malayê Cezîrî re tê, ew xwendekara dibistana Melayê Cezîrî ye û saziya Berezanî ye, gelek helbestên wî ezber kirine, her wiha di bin bandora nifşa helbestvanên salên heştêyiyan de maye ên wek Selîm Berekat, Mehmûd Derwîş û Nizar Qebanî .
Ebîr raman, helbestên nûjen û azad û helbestên pexşan bi zimanên Kurdî û Erebî bi şêweyekî xweş dinivîse, tîpên wê nazik in û gotinên wê xwe berdidin dilan, giyan şad dikin û birînan derman dikin.
Di sala 2021'an de helbestvan Ebîr Dirê'î yekemîn dîwana xwe ya helbestan bi forma elektronîk bi navê "Dema ku ez piçûk bûm" çap kir.
Dûv re, li Misir - Pêşangeha Pirtûkan a Navneteweyî ya Qahîreyê, wê berhema xwe ya herî girîng, "Sibeha Min Tuyî" çap kir, ku di sala 2023'an de xelata yekem û Mertalê Zêrîn wergirt.
Her wiha ji aliyê Rêxistina Cîhanî ya Geşepêdan û Aştiyê ve wek Balyoza Niyazpak hat hilbijartin,rêzgirtin ji bo rola wê di piştgiriya zarokatî û jinan de û belavkirina çanda diyalog, hezkirin û aştiyê.
Ebîr çend destnivîsên wê yên helbestan amade ne ji bo çapê,
ew niha li ser pirojeya pirtûka helbestan a bi navê "Şevên Amûdê" kar dike, ji bilî dîwaneke helbestan a bi zimanê kurdî bi navê "Rêzana ",ev nave ku malbata Seydayê Cegerxwîn di zarokatiya wê de lê kiriye , wekî nîşanek ji hezkirin û peywendiyên germ ên ku di navbera wan û bav û kalê wî de hebûn, herwisa helbestvan Cemîl Darî jî ji bo naskirina dengê wê yê bêhempa û hebûna wê di qada helbestê ya herêmê de, navê wê kiriye "helbestvana Amûdê"
Xwe amade dike ku yekemîn berhema xwe ya wêjeyî ya bi navê Şevên Amûdê bi zimanê kurdî çap bike.
Ew niha bi karê Serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd ên Sûriyê - Şaxa Amûdê radibe û di heman demê de endama desteya sererastkirinê ya malpera îkonên Kurdî ye.

Beşdariya wê ya berfireh di bûyerên çandî û festîvalên wêjeyî de heye, di nav de:
1- Festîvala Helbestê ya Kurdî li Sûriyê.
2- Festîvala Çandî ya Yekem li Cezîrê.
3- Festîvala Wêje û Hunerê ya Jinê li Rojava.
4- Festîvala Girsor ya duyemîn — 2024.
5- Festîvala Girsor ya sêyemîn li Qamişlo — 2025.
6- Festîvala Navneteweyî ya Pirtûkê — 2025.
7- Festîvala Arşev Oskan — li Dêrbêsiyê."
Her wiha Ebîr beşdarî gelek şevbuhêrk û çalakiyên çandî yên li Rojava bûye , deng û ramana xwe di belavkirina çandê û piştgiriya wêjeya kurdî de dike.
Ebîr bi giranî bi zimanê Erebî dinivîse, û hewldanên wê yên pêşketî û bedew jî bi zimanê Kurdî hene, ew Ramînan, nivîsarên pexşan û gotarên edebî dinivîse û di wê baweriyê de ye ku nivîsîn welatekî din e ku rûh dikare li wê bimîne bê ku were dûrxistin.
Berhemên wê di piraniya platformên (menberên) çandî yên Erebî û Kurdî de hatine weşandin, ji wan:
Nivîskar - Rewşenbîr - Pênûsa Azad - Kurdistan - Ronahî - Sîwan - Konê rewşenbîran - îkona Mezopotamyayê û yên din.
Her wiha di gelek hevpeyvîn û bernameyên televîzyonê yên têkildarî festîvalên wêjeyî û çandî de beşdar bûye.
Ebîr cihê jina Kurd di nava dîmena çandê de ji nû ve bi cih dike, ne di rola wergir û afirîner de, lê di rola pêşeng û biryarder û dîtinê de.
Bi vê yekê, ne tenê mîrasê diparêze, di heman demê de bi rêya jin, civak û nivîsandina hevpar qadeke nû ji bo domandina wê diafirîne.
Helbestvan Ebîr Direî yek ji dengên jinan ên navdar û çalak li herêma Cezîrê tê hesibandin , ku bi giyanek nûbûyî û afirîneriyeke geş dara edebiyata kurdî av dide û ew dinivîse ji bo ronahiyekî mezinir ji bo miletekî ku ji helbestê tê dinyayê weke ji çiyayê berxwedanê tê jiyanê.
Ebîr ev hezkirina wêjeyî û çandî ji koka xwe ya kûr di malbateke hunerî ya kevnar de li Rojavayê Kurdistanê girtiye, ku mala wê dîdargeha huner, muzîk û peyvê bû.
Ew keça hunermendê şêwekarî û şahê bilûrê yê ku bi dengê xwe yê xweş û hebûna xwe ya ronak tê naskirin, Ebdulrehman Direî ye, ku hezkirina huner û muzîkê di dilê wê de çande, û herwiha xwîşka wênesaz û hunermenda şêwekarî, Dr: Semer Direî û helbestvan û nivîskar Nexem Direî ye , yên ku bi wê re malbateke ku bi afirînerî û nasnameya çandî ve girêdayî ye avakirin, ku mîrateya xwe ya kurdî parastin û ji bo dewlemendkirina dîmena çandî û hunerî li herêmê, roleke mezin lehîstin.
Ez ji wê re ronakbûn û serkeftinek zêdetir di karê wê yê afirîner û wêjeyî de dixwazim.

## Têbînî



**Çand û huner li hember gotara nefretê**

**Kemal Necim**

Li gorî danasînên Neteweyên Yekbûyî, gotara nefretê çavkaniya xwe ji rehên kûr ên derûnî, civakî û siyasî digire, wek tirs, hêrs, nezanî û avakirina dîmeneke neyînî li ser hin koman. Krîzên aborî û siyasî jî dihêlin ku gotara nefretê zêde bibe, her wiha amûrên ragihandinê yên nûjen (wek medyaya civakî) belavbûna wê hêsan dikin. Gotara neftertê li dijî kêmnetewe û nasnameyên cihêreng (ol, nîjad, zayend, meyla cinsî, seqetî, hwd.) pêk tê ji bo bidestxistina hin destkeftiyn. Gotara nefretê dibe eger û destpêka cudakarî û tundiyê di nava koman û civakan.
Li welatekî weke Sûriyeyê ku êşa şerê navxweyî kişandiye, niha metirsiyên hîn girantir derdikevin pêş, ew jî metirsiya gurbûna gotara nefretê ye.
Ji xwe rê û rêbaz û alavên kêmkirin û pêşîgirtina gotara nefretê pir in, lê ya herî berbiçav çand û huner e.
Çand û huner ji bo pêşîgirtina gotara nefretê roleke girîng dilîzin ji ber ku çand û huner berê xwe didin kûrahiya giyanê mirovan, her wiha ew nakokî, arîşe û cudahiyên siyasî, olî û etnîkî derbas dike.
Lê gelo çand û huner çawa dikare gotara nefretê hilweşîne?, ji ber sedemeke girîgn a gotara nefretê nezanî ye, çand û huner pirsên rexnegir pêşkêş dike û gotarên alternatîf ên li ser bingeha hiş û zanînê diafirîne û derewên gotara nefretê eşkere dike. Wêje, şano û sînema dikarin eger û sedemên nefretê eşkere bikin û encamên wê yên wêranker ji bo kes û civakê nîşan bidin.
Wekî din jî, ji ber ku paşxaneyên nijadî, olî, civakî û zayendî gotara nefretê kûr dikin, çand û huner cihêrengiya mirovan vediguhere hebûneke pîroz, cûdahiyê li şûna ku bibe egera pevçûn û nakokiyê, vediguherîne jîngeheke dewlemendya çandî. Bi rêya muzîk, hunerên şêwekarî û sînemayê, mirov çand û ezmûnên cûda nas dikin, tirsa ji "yên din" kêm dikin û nirxên jiyana hevbeş û rêzgirtina hevdû xurt dikin.
Tê zanîn ku gotara nefretê di demên aloz de zêde dibe, wekî pêvajoyên şerên navxweyî, lewma rola çand û hunerê ew e ku bîrdanka civakan zindî bihêle, ango bi rêya çand û hunerê êş û azarên civakan têne pêşandan û nivîsîn, da ku careke din ew êş dubere nebin. Her wiha li şûna çanda paşguhkirin û dûrxistinê çanda hevdû naskirin û pejirandinê pêş dikeve.
Civakên ku nêzîkî hev in, ango bi hev re di diyalog û danûstandinê de ne, li hember gotara nefrtê bêhtir parastî ne, lê civakên ji hev dûr ku derfet û qadên wan ên hevdûnaskirinê û danûstandinê tune bin dibin qurbaniyên kîn û nefretê.
Di vê mijarê de çalakiyên çandî yên hevbeş ên mîna mihrîcan û pêşangehan, dibin jîngeh û qadeke guncaw ya danûstandin û hevûnasîna kesan û civakan, ev hevûnasîn û diyalog sedemên gotara nefretê kêm dike û gotareke hevpar li ser bingeha mirovahiyê pêş dixe.
Pir diyar e ku kêmkirin û pêşîgiritn yan jî jiholêrakirina gotara nefretê di nava civakan de, ji kiryar û hewldanên zagonî bêhtir, hewceyî projeyek çandî û hunerî ya demdirêj e. Projeyeke ku bibe egera çesipandina nirxên lêborîn û hevdûprjirandinê.

# Mirina komî ya golikan li gundê Um Elfursan ê Qamişlo

Li gundê Um Elfursan ê bajarê Qamişlo ji ber nexweşiya Qulai ya ajalan bi dehan golik mirine û termên wan li nêzî taxê hatine avêtin. Ev yek jî bûye sedema derketina bêhna xerab û belavbûna kêzikan.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Termê bi dehan kolig ku ji ber nexweşiya xurikê mirine, li nêzî taxa Um El-Fursan a bajarê Qamişlo hatine avêtin, ev yek jî bûye sedema derketina behneke xerab û belavbûna kêzikan. Ji ber vê yekê şêneyên taxê ji bo nivîsgeha Tenduristiyê gilî kiribûn. Piştî wergirtina giliyên şêneyan, Rêveberiya Nisvîgeha Tenduristiyê serdanek meydanî li taxê kir û bi awayekî rasterast cih vekolîn kir.

Hate diayrkirin ku di navbera 35 heta 40 golikên mirî li nêzî xanên taxê hatin dîtin. Bêhnek genî ji ber helandina laşan hebû, di gel belavbûna kêzikan a balkêş.

Piştî ku nivîsgeha tenduristiyê pirsîna xwediyên xanan kir, wan diyar kir ku mirina lawirên wan ji ber belavbûna nexweşiya Qula'i di nav golikan de çêbûye, ku tevî hewldanên dermankirinê jî bû sedema mirina bi dehan golik.



**Rewşa heyî xeteriyekê li ser jîngeh û niştecihan dike**

Girîng e ku çavkaniya nexweşiyê were şopandin û tedbîrên pêşîlêgirtinê werin girtin da ku rê li ber veguhestina wê ji bo lawirên din an bandora wê li ser tenduristiya giştî were girtin.

Derbarê vê yekê endamê nivîsgeha tenduristiyê ya şaredariya Qamişlo Neîm Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Neîm Mihemed diyar kir ku ev nexweşiyeke vîrusî ya vegirtî ye ku di nava lawiran de dibe sedema tayê, birînên dev, germahiya bilind, kêmxwarinî û wiha got: "Ev nexweşî ji bêhnvedanê an ji hewa tê vedan, herwiha dema ku xwarina ajalan ne paqij be û di heman demê de ji amûrên ku tên bikaranîn ji bo lawiran çêdibe. Di vê rewşê de divê lawirên ku bi vê nexweşiyê ketine ji yên din bên veqetandin."

Nivîsgeha terndurıstiyê tekez kir ku rewşa heyî ji ber bêhn, helandin û belavbûna kêzikan xetereyek rasterast a jîngehî û tenduristî ji bo niştecihên taxê çêdike. Pêdivîyeke lezgîn heye ku laşên mirî li gorî standardên tenduristî û jîngehî yên pejirandî ji holê werin rakirin.

**'Divê xwediyê lawiran çavêdêriya lawirên xwe bikin'**

Endamê nivîsgeha tenduristiyê ya şaredariya Qamişlo Neîm Mihemed wiha anî ziman: "Dermankirina diyarkirî tune ye ji bo nexweşiyê, lê dermanên êşê, antîseptîk an jî ava xelê û merhema zinkê xwediyên lawiran dikarin bikarbînin, di heman demê de divê xwerina lawiran yan nerim bê dayîn ji bo xwarinê, ji ber ku dema lawir bi nexweşiyê dikeve êdî nema kare xwerinê daqurtîne. Ev nexweşî ji hefteyekê heya 10 rojan dirêj dike, piştre lawir vedgere rewşa xwe ya berê lê divê xwediyê lawiran baş li wan binêre û çavdêriya wan bike."



Rêveberiya Nivîsgeha Tenduristiyê tekez kir ku di vê rewşê de divê rayedarên şaredariyê bi lez ji bo rakirin û avêtina laşên lawiran bi awayên tendurist (binaxkirina paqij an şewitandina di bin çavdêriya pisporan de) tev bigerin. Di heman demê de divê rewşa veterîneriyê ya li taxê were şopandin û divê testên laboratîfê werin kirin da ku cewherê nexweşiyê û rêbazên pêşîlêgirtinê werin piştrastkirin. Hişyariya xwediyên xanan bê kirin li ser girîngiya ragihandina zû ya her rewşên nexweşî yên wekhev û girtina tedbîrên pêşîlêgirtinê.

# Li bajarokê Til Cemal nangehek hat vekirin

**Jîn Hisên/Girkê Legê**

**Bi aramnca peydakirina domdar a nan ji şêniyan re, li bajarokê Til Cemal yê girdayî Girkê Legê nangeheke nû hat vekirin, ev nangeh wê karibe nan ji şêneyên 24 komînan re dabîn bike.**



Meclisa Çandinî û Aboriyê ya Kaatona Cizîrê yek ji pilanên wê yên sala 2025'an ku hinek nangehên nû li bajar û bajarokên kantona Cizîrê veke. Ev gav bi aramnca piştgiriya aramiya jiyanî û xurtkirina ewlehiya xwerinê ya sivîlên herêmê ye. Di heman demê de di nava rêzehewildanên başkirina xizmetên sereke û peydakirina pêdiviyên şêniyan e.

Meclisa Aborî û Çandiniyê ya Kantona Cizîrê li bajarokê Til Cemal ê bajarê Girkê Legê nangehek nû vekir ku bi yek xeta hilberînê ve hatiye sazkirin û dikare nan ji bo 24 komînan dabîn bike. Armanca wê ew e ku bi dabînkirina domdar a nan û pêdiviyên sivîlên bajêr bicîh bîne, bi vî rengî şert û mercên jiyana wan wê baştir bike û têkoşîna wan a rojane ya ji bo bidestxistina vê pêdiviya bingehîn sivik bike.

**Li ser daxwaza komînan nangeh hat vekirin**

Piştî avakirina Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê gelek pilanên istratîjîk yên giring dan pêşiya xwe bi komîteya nangehan re, hinek proje ketin pratîkê de û bi demê re têne pêkanîn.

Ev proje hem ji sererastkirina nangehan yên giştî kantonê û peydakirina parçeyên nangehan, hem jî pêşxistina xeta hilbirînê, avakirin û vekirina nangehan.

Tê payîn ku ev nangeh li ser daxwaz û pêşîniyarên komînên bajarokê Til Cemal hat vekirin. Demeke dirêj li ser nangehê kar û xebat hat kirin di hemû milan de, karkerên nangehê jî hatin amadekirin ji kesên pispor û xwedî tecrûbe.

**Nangeh dikare nan ji şêneyên 24 komînan re dabîn bike**

Nangeha a ku li bajarokê Til Cemal hat vekirin wê karîbe hewcdariyên 24 komînan ji bo nan peyda bike û rojane wê ji bo xizmeta şêniyan bixebite. Armanca vekirina firneyê ku nanê baş û paqij li gorî pîvanên ku tê xwestin; peyda bike.

Hêjayî gotinê ku komîteyên firnan wê di bajarokê Til Cemal de rojane karê firneyê bişopîne, da ku bibînin kar çawa tê meşandin. Eger gazinên şêniyan hebin karin di riya aliyên têkildar re dengê xwe bighînin me.

**Li gorî pîvanên pêwîst wê nan bighêje ber destê şêniyan**

Ji bo ku nanekî xwedî qalîteyeke baş û li gorî pêvanên pêwîst bighêje ber destê şêniyên bajarokê Til Cemal yê girêdayî bajarê Girkê Legê, vekirina nangehê gaveke pir giring bû. Herwiha ev yek dibe alîkar ku peydakirina nan a berdewam ji bo şêniyên bajêr misoger bibe, têkoşîna wan a rojane ya ji bo bidestxistina vê madeya bingehîn sivik bike û aramiya aborî û ewlehiya xwarinê li herêmê zêde bike. Vekirina nangehê beşek ji planên Meclisa Aborî û Çandiniyê ye ji bo pêşxistin û baştirkirina xizmetguzariyên bingehîn li bajarê Girkê Legê ye.



# Berxwedana ku dîrok nivîsand... Bendava Tişrîn

Bendava Tişrînê ku di 8'ê Kanûna 2024'an de di nav hêvî û tirsên heremê de asê mabû, saleke li pey xwe hîşt. Dewleta Tirk û çeteyên wê dixwestin ku bi êrişên hovane binesazî û jiyana gelên herêmê mehkûmî tarîtiyê bikin, lê belê îradeya gel ew tarîtî şikand û bi berxwedaniya 118 rojan a bi rûmet careke din derket ser dika dîrokê.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Bendava ku bi navê bendava şehîdan hatiye naskirin di dilê Gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de lêdide, ew bendav di navbera hêvî û tirsên heremê de asê mabû. Ew axa ku li hemberê her cûre êrîşan xwe zindî hîşt bi berxwedaniya xwe ya bi rumet derketiye ser dika dîrokê. gelên heremê ku bi salane di bin siya şer û Ambargo û ji çar aliyan ve êrîşên ku li ser wan dihat meşandin berxwedan. Pêkhateyên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê yên ku herê zêde bûye qurbaniyên êrîşan bi koçberî û gelek kiryaran re rû bi rû mayî ye.

Di sala 2014'an de Çeteyên DAIŞ'ê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatibun perwerdekirin bi awayek hovane erîşên herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê kirin bi hezaran jin zarok û ciwanan bûn qurbaniyên şer heman demê de gelek jin jî rastî tacîz Tecawûz û firotênê hatin. Herwiha 2018'an de jî Efrîna ku bihuşta ser ruyê erde bû ji aliyê Çeteyên dewleta Tirk ve hat dagirkirin û bi hezaran kes rastê gelek kiryaran hatin. Gelê Efrînê neçarma ku koçberê şehbayê bibe, Bi heman armancê 2019'an de jî li Serê Kaniyê û Girê Spî jî êrîş pêk hat. Îro bi hezaran gelê ku malên wan hatine dagirkirin di bin Konan de jiyana xwe didomînin. herê dawiyê jî di 8 Kanûna 2024' an de bi hilweşandina Rejima Baas re Dewleta Tirk bi armanca ku herêma firatê bike bin dagirkeriya xwe de rê yên çûtin û hatinê di navbera gelan de qut bike. Çeteyên ku li Tirkiyê perwede kiribû carekedin bere wan de Rojava ji bo ku axa Rojava dagir bikin. Lê bi saya berxwedaniya ku hat meşandin xeyalên wan têk çûn. Gel bi dayîna berdêlên giran jî bi rihê şoreşa 19'ê Tîrmehê parastina axa xwe kir…

**Çima Bendava Tişrîn û Pira Qereqozax**

Bendava Tişrînê û Pira Kerekozaxê ji aliyê aborî, siyasî û leşkerî de gelekî girîng in. Pira Qereqozax li ser rêya M4 a navdewletî ku herdu aliyên çemê Firatê bi hevre girê dide, ji bo bazirganiya herêmê jî girîng e. Bendava Tişrînê jî pêdiviya piraniya kehrebê ya Kantona Firatê û Minbic, beşek Heleb û hinek deverên Tebqayê û Cizîrê pêk tîne. Dîsa ji bo çandiniyê jî çavkaniyek sereke ye. Ji bilî van taybetmendiyan herdu dever ji bo ewlekariya herêmê di asta stratejîk de ne. Li gorî pisporan, hêzên ku li van deran serwer bibin, wê karibin tevahiya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî kontrol bikin. Dewleta Tirk a dagirker jî, dema HTŞ'ê berê xwe da Şamê, bi van hesaban xwest Tişrîn û Qereqozax dagir bike û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Rayedarên Tirkiyeyê bi daxuyaniyên xwe ev yek eşkere dikirin. 2024–2025 Bendava Tişrîn û Pira Qereqozax bûn armancên êrîşên dewleta Tirk. Di 8'ê Kanûn a 2024'an de li Bendeva Tişrînê dest bi êrîşan kirin. li hemberê wan êrîşan ji nû ve avakirinek bihêz û hevgirtî li benda gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bû. Êrîşên Çeteyan ne tenê li ser çeperên leşkeri bû, lê li ser binesaziya heremê, gund, nexwaşxane, îstasyonên avê û malên gel hatin hedefgirtin. Şerê ku li Bendava Tişrînê û Pira Qereqozax hat meşandin ne şereke leşkeri bû, Şerê taybet û şereke derûnî ku dixwastin hêviyên gelê heremê tune bikin. Armanc ew bû ku bi van êrîşan nûfûsa heremê mehkûmê taritiyê bikin. Lê bele îradeya gel ew tarîtî şikand û carekedin bi hevgirtin û berxwedaniya xwe xwe dan ispatkirin.

**Banga Rêveberiya xweser ji bo gelê heremê**

Di 8'ê Çile de li ser banga Rêveberiya Xweser bi hezaran şêniyên bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo av, ax, enerjî û destkeftiyên xwe biparêze li Tişrînê dest bi nobetê kirin. Li gel êrîşên li ser bendavê, konvoyên ku gel ji bo biçin bendavê ava kirin, gelek caran rastî êrîşan hatin. Rûxmê hemû êrîşan jî gel ji doza xwe venegeriya bi israr xwe gihandin bendavê. Her roj derdora bendavê ji aliyê balafirên şer ve dihatin bombebaran kirin. Tevî vê yekê jî bi sedan kes ji bo piştgiriyê bidin çalakiya nobedê bê navber diçûn qada bendavê. çalakiyên ku 8'ê Çileyê ve destpê kir 118 rojan dom kir.

**Bi berxwedana gel, dagirkerî têk çû**

Berxwedana Dîrokî ya şervanên YPG -YPJ- QSD'ê û ya Gelê herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ya 118 rojan bi dayîna gelek berdelên mezin domkir. Piştê ku Rêveberiya xweser bang li gelê herêmê kir. Pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan, Êzîdî û hwd.. ji 7 heta 70 salî herikîn bendava Tişrînê parastina av, ax û enerjiya heremê kirin. Rûxmê ku her cûre êrîş jî pêk dihatin çekên ku heta niha li Bakûr û Rojhilatê sûriyê nehatibûn karanîn ji aliyê dewleta Tirk û Çeteyên wê ve li Ser bendavê hatin karanîn. Balafirên bê mirov, çekên giran û bi çekên kîmyewî konvoyên gel kirin armanc. Gel di nav wan êrîşan de bi îradeyek xort mesajên giring da dewleta Tirk a dagirker ku gotin "Em ne yek deqe û yek kêliyek ranewestiyan. Em carek din dûbare dikin em dev jî bendavê bernadin. Û piştevaniya QSD'ê bikin û em ê berxwedana xwe bidomînin. Em ê li vir bin. Em ê ruhê şoreşê ya 19'ê Tîrmehê biparêzin."




**Rola çapemiya azad di Bendava Tişrînê de**

Di pêvajoya ku Bakûr û Rojhilatê Sûriyê di nav qazana agir de dikeliya, çapemeniya dewleta Tirk bi armanca Rûxandina civakê berê xwe da şerê taybet yê çapemeniyê ku bikaribe herêmê di rêya vî şerî de dagirbike û demografiya herêmê biguhere, bi dehan malper û ajansên xwe vekir bi rêya medyayê de di nav civakê de tirsek da avakirin. Gelek dîmenên ku bere li Efrîna dagirkirî hatibûn kişandin wêkê ku li bendava Tişrînê û Pira kara kozaxê dagirkirinê nîşan didan. Lê çapemeniya azad raste rast berê xwe da bendavê û rastiya heyî ji raya giştî re ragihand ew jî Bi saya Rojnamevan Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn ku di 19'ê Kanûnê de di encama êrîşa hewayî ya dewleta Tirk de şehîd bubûn derket. Heman demê de gelek Rojnamevan ji ber ku kêlî bi kêlî rastiyan radigahandin bun armanca êrîşan 9 Rojnamevan di erêşîn hewayî de birîndar bûn û Rojnamevan Egîd Roj jî di 15 Sibatê de şehîd ket. bi her şahedetekî re rojnamevan rûxmê ku rastê tehdîdan dihatin jî soza ku heta hênaseya xwe ya dawiyê li ser şopa rastiyê bişopînin ku pênûs û kamerayên hevalên xwe yên şehîd li erde nehêlin têkoşiyan.

**Hedefgirtina pêşengên şoreşa Rojava**

Dewleta Tirk a dagirker ji bo ku xeyalên xwe yên osmanî pêk bîne raste rast pêşengên şoreşa bakûr û Rojhilatê Sûriyê kir hedefa êrîşan. di gelek wêne û dîmenan de jî dihat dîtin di bin balafiran de bi tilîkên serkeftinê parastina av ax û enerjiya xwe kirin. Bendava ku av û xuyn bibû yek rûxmê wî jî bi îradeyek xort rîsaleyên ku "Em ji mirinê mezintirin"me çawa 2014'an de di êrîşên hovane yên Çeteyên DAIŞ'ê de kefenê mirinê çirand emê îro jî biçirînin" dan êrîşkran. Di berxwedana Tişrînê de 26 welatiyên ku pêşengtî ji şoreşa Rojava re dikir wek Menîce Haco û bavê Teyar ku şanogerbû ku her zarokek li ber pêkanokên wî mezin bûbun û gelek kesên ku navê wan nehatine jimartin, di nav de rojnamevan, siyasetmedar, rêveber û hunermend jî hene şehîd bûn û herî kêm 240 kes jî birîndar bûn.

**Berxwedana 118 rojan bi ser ket**

Bi saya berxwedana gelê heremê û îmzekirina hevpeymana 10'ê Adarê ya di navbera Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Ebdê û Rêveberiya demkî ya Hikûmeta Şamê Ehmed El Şara ve ku ji 8 xalan pêk dihat îmzekirin. Di xalalên hevpeymanê de nûnertiya wekhev a bawerî û nasnameyên niştimanî yên gelê Sûriyê, dabînkirina xizmetguzariyên ewlekarî û giştî, vegera bi ewle ya koçberan, rawestana li hember axaftinên nijadperestiyê û helwestên ku dê nakokiyan derxînin û misogerkirina agirbestê li seranserê welat. Di encama nobeta gel û berxwedana dîrokî ya şervanan de êrîşên li ser Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaxê hatin rawestandin. Rêveberiya xweser ya demokratîk bi daxuyaniyek çapemeniyê raya giştî re ragihand. ku "Berxwedana gel ser ketiye".

## Qêrîna Bêdeng a Beravê!

**Erdogan Altan**

Îro bi taybet li bajarên Latkiye û Tartûsê yên Berava Sûriyê di bin siya şer û pêvçûnan de civakek qêr dike. Beravên Sûriye, bi taybet bajar û navçeyên Latkiye û Tartûs tenê ne erdnigariyek e; di heman demî de qadek azmûnê ye jî. Êrîşên bênavber, kemîn û komkûjiyên mezhebî dibin sedema qetilkirina sedan Elewiyan.

Ev wêne, honandina civakî ya heremê tehdît dike û ger pirsgirêkên ewlehiyê bi awayek xûrt neyê destgirtin, xuyaye dê tundiya mezhebî ji nû ve gur bibe. Beravên ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve wek e "Qada Xeter" pênase dike, ji bo parastina îstîkrarê li benda piştgiriyek bi lez e.

Aborî xirabûye û di hêla civakî de hilweşîn heye. Lewra şewat û pêvçûnên heyî, çandiniyê, daristanan û binesaziyê xirab kiriye, têk biriye. Desthiladarê Şamê ku ji aliyekê ve bi talîmatên dewleta Tirk bi riya komên çete girêdayên wê komkujî, xirabkirin, talanî pêk tîne, ji aliyekê din ve jî ji bo razemeniya herêma Berava Sûriyê ji dewlet û hêzên navneteweyî û Ereb pereyan kom dike. Tê payîn ku heya niha 1.8 milyon dolar pere kom kiriye. Şûna ku van pereyan ji bo herêma Beravê xerc bike, vê yekî li hember civaka Elewî wek e tehdît bikar tîne. Ango an hûn li gorî me tevbigerin an jî yek qirûşek ji bo vir xerc nakin. Li gor agahiyan heya niha hemû noqte û baregehên leşkerî, îstîxbaratî û sivîl ên ji bo dewleta Tirk û komên çete hatine çêkirin ji vê pereyê ku hatiye komkirin e.

Her wiha noqte û baregehên leşkerî yên dewleta Tirk ên ji Masyafê bigire heya Ceblê, hevsengiyên di heremê de aniye rewşek tevlîhevtir. Ji wê zêdetir, HTŞ ku çekan li komên Sûnî belavkiriye, hêmaneke din a ku pêvçûnên mezhebî gurtir dike ye. Hebûna komên çete yên biyanî yên wek e Ensar El Tevhîd, Ensar El Sune û Ensar El Dîn, gelê heremê tahrîk dike û bi gotinên mezhebî gurtir dike. Komkujiya di herêma El Radar a Tartûsê, kuştina hovane ya ciwanan, di hafizeya civakê de birînên kûr vedike. Çeteyên ku fuzeyan bi şevê di ser gundên ku bê elektrîk (kehrebe) hatine hiştin davêjin, jiyana rojane ya gelê heremê dizivrîne dojehê.

Bêguman hebûna Rûsya ya leşkerî û siyasî, di herêma beravê de hevsengiyên nû diafirîne. Baregeha Hewayî ya Himêmîm tenê ne navendek leşkerî ye; di heman demî de dilê stratejiyên heremî ye. Yekîneyên nû yên ku bi piştgiriya Rûsyayê hatine avakirin, belavkirina hin çekan a li ser koman û bi bernameyên perwerdeyan bihêztir dike.

Pîrên Elewî, ji bo piştgirî bidin civakê konseyên sivîl û yekîneyên tenduristiyê ava dikin; cemeatên Xiristiyan bi komên çavdêr re di qadê de agahiyan kom dike. Ev tevger û hewildan, herêma Beravê ne tenê qadeke leşkerî ye, di heman demî de nîşaneya ku ziviriye qadeke têkoşîna civakî ye.

Hebûna cih û mekanên seyranê û gundên ji bo seyrangehê, ji welatên Kendavê eleqeya şîrketan a ji bo heremê zêde dike. Lê ev eleqe, di bin siya guherîna dest a erdê civakê ya heremê û revandina ciwanan a bi awayek hovane de dihêle.

Ev tevlîheviya ku di herema Beravê de tê jiyîn, ji bo Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî firsend û xeteriyên nû diafirîne. Bi saya îstîqrara sazîbûyînê ya Rêveberiya Xweser, di diyalogên siyasî yên rojên pêş de, zêdetir dikare pozîsyoneke muzakereya bi hêztir bidest bixe.

Lê ev rê, girêdayê berdewamiya nêzîkatiyek rasteqîn e; ewlehiya navxweyî xûrtkirin û tora xwe ya diyalogê berfirehtir kirin e.

# Geşedanên Sûriyê yên 2025'an

Li Sûriyê piştî hilweşîna rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz, geşedanên cihêreng rûdan. Bi dirêjahiya salekê re gelên Sûriyê bûn şahidê rûdanên cuda û her mehek ji sala 2025'an geşedaneke cuda û bi bandor li şûna xwe hişt.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Çile**

-Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet li gundewarên Minbic, Bendava Tişrîn û pira Qereqozaqê ji destpêka ruxandina rêjîma Beisê ve berxwedaniyeke bêhempa ji hêla QSD'ê ve dihat domandin. Di encamê de Minbic û herêma Şehbayê kete bin dagirkeriya Tirkiyê û çeteyan de. Lê şer li gel hewildanên lihevkirina siyayasî di navbera hikumeta veguhêz û Rêveberiya Xweser de dihatin domandin.
-Di 12'ê Çileya 2025'an de qaşo ji bo pêkanîna ewlehiya Sûriyê, hikumeta veguhêz civîneke berfireh li Siûdiyê bi beşdariya berpirsên Ereb û biyanî re li dar xist.
-Wekî geşedaneke siyasî ku girêdayî rewşa ewleyî ya û pêkanîna yekrêziya Kurdî Rojavayê Kurdistanê di 16'ê vê mehê de fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê û serokê PDK'ê Mesûd Berzanî li Başûrê Kurdistanê civînek li dar xistin.
-Di 27'ê Sibatê de Rêber Apo banga dîrokî kir, ev bang bandor li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir û paşê bû sedema pêkanîna peymanên istratejîk ji bo rawestandina şer li gelek deveran.
-Meclisa Sûriyaya Demokratîk(MSD) bi armanca xurtikirina têkiliyan pê re jî pejirandina sîstemeke guncav ji bo pêşeroja Sûriyê bi rûspî û oldarên Siwêdayê re hevdîtinek di 28'ê Çile de li Siwêdayê çêkir.

**Sibat**

-Di 6'ê Sibatê de karwanekî ku ji 60 erebeyan pêk dihat ên Ewlekariya Giştî ya hikumeta veguhêz derbasî Efrînê bûn.
-Di 14'ê Sibatê de wê 61'ekemîn Konferansa München a Ewlekarya Cîhanî ya'ê ya salane li parêzgeha Miyûnxa Elmaniyê bi amadebûna serokên dewletên cîhanê, siyasetmedar, wezîr, şêwirmend, parêzer û hwd bê lirdarxistin. Yekem car ku bi fermî nûnerên Kurdan tevlî bûn, rewşa Kurdan û Rojavayê Kurdistanê tê de jî hin xalên girîng hatin eşkerkirin.
-Di navbera 24 û 25'ê Sibata 2025'an de kongreya niştîmanî ya (yekalî) ji hêla hikumeta veguhêz ve hat lidarxistin û tê de jî tevahiya gelên Sûriyê beşdar nebûn.

**Adar**

-Hikumeta veguhêz a Sûriyê li berava Sûriyê li dijî civaka Elewî gelek komkujî li dijî wan pêkanînin, kiriyarên hikumeta veguhêz ji 7 Adarê dest pê kirin, li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê heta miha Îlonê zêdyî 1700 kes ji pêkhateya Elewî hatine kuştin.
-Di 10'ê Adara 2025'an de di navbera fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê Mezlûm Ebdî û hikûmeta veguhêz a Sûriyê de peymanek bi navê Peymana 10'ê Adarê ku ji 8 xalan pêktê, hate îmzekirin.
-Di 13'ê Adarê de desthilata Şamê wesîqeya destûra Sûriyê bêyî ku bi hemû pêkhate, rêxistin, partî û hwd… re bicive, ragihand. Wekî tê xuyakirin ev gav nemazeyek ji çêkirina sîstemeke navendî, li dijî mafê hemû pêkhateyan, bawerî, bîrdozî û jinan bû.
-Di 22'ê Adarê de 35 sazî, kom û partiyên siyasî û sivîl li Sûriyeyê damezrandina "Hevpeymaniya Hemwelatiya Wekhev a Sûriyeyê" bi beşdariya MSD'ê li paytexa Şamê civîneke çapemeniyê ragihand. Di civînê de "Hevpemaniya Hemwelatiya Wekhev a Sûriyeyê" biloka siyasî bi navê "Hevgirtinê" hat avakirin.

**Nîsan**

-1'ê Nîsana îsal di navbera Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û hikumeta veguhêz ên Helebê de peymanek têkildarî her du taxan hatibû îmzekirin. Di çarçoveya pêkanîna peymanê de, 7 bendên kontrolê yên hevbeş ên di navbera hêzên ewlehiya giştî û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên her du taxan de li ser rêyên sereke hatin danîn.
-14'ê Nîsana 2025'an de şandeyeke ku ji 12 parlamenterên Parlamentoya Ewropayê û ya Brîtanyayê û endamên saziyên civaka sivîl ku yên Kurd jî di nav de hene, serlêdana Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Şande li Navenda Giştî ya Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a li Qamişlo ji aliyê hevserokên daîreyê Îlham Ehmed û Fener Giêt û her du cîgirên wan Gulistan Elî û Robêl Beho ve hat pêşwazîkirin.
-Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê li Parka Azadî ya bajarê Qamişlo di 26'ê Nîsanê de hat lidarxistin. Ji Rojava, Tirkiye, Herêma Kurdistana Iraqê û deverên din ên Sûriyê, nûnerên partî û hêzên kurdî zêdekirî 400 delge beşdarî konferansê bûn.
-Di heman demê de 26'ê Nîsanê Meclisa Leşkerî ya Siwêdayê ragihand ku wan Hêza Berevaniya Sînor û çend baregehên ewlehiyê li bajêr ava kirine.

**Gulan**

-Bi dirêjahiya 3 rojan ku ji 15 heya 17 Gulanê Kongreya Yekem a Piştî damezrandina (NADA) di bin dirûşmeya 'Bi Şoreşa Jinê Ber bi Civakek Demokratîk ve' li bajarê Silêmanê bi beşdarbûna ji 18 welatan û zêdeyî 200 delege hate lidarxistin. Kongre bi nirxandinên girîng û dewlemend hate derbaskirin û bi encamnameyekê bidawî bû.

**Pûşper**

-Di 22'yê Hezîrana 2025 de encama êrişa xwekuj ya li dijî Dêra Mar Elyas a li Şamê de 22 kesan jiyana xwe ji dest da û 63 kes jî birîndar bûn.

**Tîrmeh**



-Rayedareke Amerîkî ragihand ku wê Amerîka di 24'ê de Tîrmehê ji bo hevdîtineke di navbera Îsraîl û Sûriyeyê de pêk were navbeynkariyê bike, piştî vê yekê êdî navbênkariya Amerîkî ya siyasî di navbera Israîl û hikumeta veguhêz a Sûriyê de dest pê bû.

**Tebax**

-Di destpêka sala 2025'ê li herêma Siwêda têkoşîneke mezin ji hêla Durziyan ve li dijî êrişên hikumeta veguhêz hat kirin. Di meha Nîsan û Gulanê de, li dijî pêkhateya Durzî kiryarên dijmirovî ji hêla hikumeta veguhêz a Sûriyê ve pêk hatin. Roja 13'ê Tîrmehê, bi destê HTŞ'ê tevlîheviyek di navbera Durzî û Erebên Bedû de çêbû. Roja 26'ê Tîrmehê, hejmar di navbera hezar 120 kes heya hezar 420 kuştî hatin ji hêla Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan ve hat belgekirin. Di 16'ê heman mehê de yekem car ku Israîlê navenda Erkan a Artêşa Sûriyê kir hedefa bombebarana firokên şer.
-Piştî êrişa 12'ê tîrmehê ya li dijî Siwêdayê yekem karwanê alîkariyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY)di rêya bi lez a di navbera Şam û Siwêdayê re di 30'ê mehê de gihiştin Siwêdayê .
-Di 27'ê Tebaxê de Meclisa Naverast a Elewiyan hate avakirin da ku nûnereke siyasî ya pêkhateya Elewî çêbibe.

**Îlon**

-Piştî bûyerên Tîrmeha 2025'an rûspî û lêvegerên olî yên Siwêdayê di 20'ê Îlûnê de banga destpêkirina lêpirsînan kir. Girêdayî wê Komîteya Bilind a Qanûnî ya Siwêdayê diyar kir ku Hikumeta Veguhêz a Sûriyeyê nehiştiye Komîteya Lêkolînkirina Rastiyan bikeve parêzgehê.

**Cotmeh**

-Ji 3 heya 7'ê Cotmehê de hikumeta veguhêz û komên çete êrişî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin, lê berxwedaneke bêhempa ji hêla Hêzên Ewlekariyê û şîneyên her du taxan ve hate raberkirin.
-Di 5'ê vê mehê de biryara 188'an a cejin û boneyên niştîmanî yên pêkhateyên Sûriyê ji hêla hikumeta veguhêz ve derket û tê de jî Newroz û Akîto hatin qedexekirin.
-Di 15'ê Cotmehê de serokê hikumeta veguhêz Ehmed Elşer çû Moskoyê da ku bi rengekî ji rengan lihevkirineke di nabera hikumeta veguhêz û Rûsyayê pêk were.

**Mijdar**

-Di 10'ê Mijdarê de hevdîtin li Koşka Spî ya Amerîkî di navebera Tirump û Ehmed Elşer de çêbû.
-Di 15'ê vê mehê de hikumeta veguhêz yekem car European Union pêçwazî kir, tê de jî hin nameyên girîng ji hikumeta pêşwazdar re ji hêla Mecilisa Ewropî ve hatin şandin.
-Di 19'ê Mijdarê de fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdî û Hevseroka Daîreya Peywendiyên Derve ya Rêveberiya XweserIlham Ehmed bi navê QSD û Rêveberiya Xweser tevlî Foruma Aştî û Ewlekariyê ya Rojhilata Navîn-MEPS 2025'an a li Dihokê bûn.
-Di 23'ê Mijdarê de hêzên HTŞa hikumeta veguhêz li Humsê êrişek li dijî welatiyan kir, welatiyên pêkhateya Elewî bûn. Ev êriş di çarçoveya şerê mezhebî û olperestî li taxên wekî Muhacirîn û Basil pêk hat. HTŞ kiriyarên terorîzmê li ser Elewiyan da meşandin, malên sivîlan şewitand û firoşgeh talan kirin.

**Berfanbar**

-Di 11'ê meha Berfanbarê de Zagona Qeyser ji hêla Meclisa Rûspyên Amerîkî ve li ser Sûriyê hat rahiştin.
-13'ê heman mehê êrişek li Tedmurê ya çolistana Sûriyê li dijî hêzên Amerîkî pêkhat û di encamê de 2 leşkerên Amerîkî hatin kuştin.
Di dawiyê de diyar dibe ku tevahiya geşedanên siyasî yên ku li tevahiya Sûriyê ji destpêka sala 2025'an heta roja îro pêkhatin, bi hev ve girêdayî bûn. Bi van geşedanan jî hat tekezkirin ku hikumeta veguhêz nebû bersiv ji gelên Sûriyê re û daxwazên gelan pêkneanîn. Vê hikumetê mîrateya rêjîma Baas hilgirt, bi dirêjahiya hatina wê jî nêzî 1500 kes li Sûriyê bi rewşên cuda hatin kuştin, piraniya wan kesan jî zarok û jin bûn. Di vê salê de rewşa ewlehî ji ber geşedanên siyasî tevlîhev bû, herwiha ji bo pêkanîna Sûriyeke demokrat û aştiyane, hewildanên Rêveberiya Xweser gelekî ber bi çav bûn. Li hêleke din wê rewşa siyasî û leşkerî li Sûriyê aram nebe, heya ku sîstemeke nenavendî û demokrasî neyê pêkanîn, da ku di encamê de her pêkhateyek bigihêje mafê xwe yê siyasî, aborî, çandî, ewlehî û hwd…



## Amerîkî naxwazin rastiya êrişa Palmêra bibînin

**Dilyar Cizîrî**

Li Palmêra ya Sûriyê çekdarek hêzên ewlekariya giştî ya hikûmeta veguhêz a Sûriyê li dijî dewriya Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê êriş pêk anî. Di êrişê de 2 leşkerên Amerîkî û wergervanekî sivîl ê Amerîkî hatin kuştin. Çend leşkerên hikûmeta veguhêz a Sûriyê jî birîndar bûn. Piştî êrişê hikûmeta veguhêz a Sûriyê bi daxuyaniyên bi nakok xwest xwe dûrî bûyerê bike û bi şaneyên DAIŞ'ê ve girêde. Balkêşe DAIŞ'ê bûyer ne girtiye ser xwe.
Berdevkê Wezareta Hundir a Hikûmeta Veguhêz bersiva nûçeyên bi wêne yên li ser kesê êrişkar weşandin, da. Got gumanên wan li ser kesê êrişkar hebû û dihat payîn roja yekşemê an ku piştî êrişê bi rojekê rewşa wî di ber çavan re hatiba derbaskirin. Di heman demê de tekez kir ku 5 hezar kes beşdarî hêzên wan ê ewlekariyê yên li çolistana Tedmur (Palmêra) bûne, ew dosyayên wan di ber çavan re derbas dikin.!
Ji xwe Amerîka û rayedarên wê jî ne xwestin rastiya êrişê ya ew ji her kesî baştir dizanin, aşkere bikin. Bê guman armanceke wan a mezin li pişt vê yekê heye. Ew jî di demên pêş de wê diyar bibe. Tişta xuya dike, tê xwestin tevgera çekdarên cihadîst û DAIŞ'ê di Sûriyê de belav û aşkeretir bibe.
Her kes dizane kesê êrişkar yek ji berpirsên HTŞ'ê bû, di pîrozbahiyên salvegera têkçûna rêjîma berê de wêneyên wî bi rayedarên herî bilind ên HTŞ'ê re hatin kişanin. Ya vê rastiyê hîn zêdetir aşkere dike, heger ne wiha ba çawa xwe gihand cihê êrişê?. Kesên normal tu carî nikarin bighêjin wê derê.
Ji bilî wî kesê êrişkar bi sedan endamên DAIŞ'ê yên di dema rêjîma berê de xwe li çola Parmêla vedişartin, tevî hêzên ewlekarî û artêşa hikûmeta veguhêz a Sûriyê bûn. Di bin sîwana wan de tevgera xwe ya DAIŞ'ê rewa dikin.
Di rojên destpêkê yên têkçûyîna rêjîma Beşar El Esed de alên DAIŞ'ê li her derê li ba dibûn. Li ser milên çekdarên wan sembolên DAIŞ'ê hatibûn danîn. Di gelek dîmenan de ev hate dîtin. Di komkujiya li Perava Sûriyê de, di êrişa li dijî Siwêda û di gelek cihên din de sembolên DAIŞ'ê aşkere beriz dikirin. Belgeya herî zêde vê rastiyê aşkere dike êrişa leşkerên hikûmeta veguhêz a li herêma Medan a li dijî hêzên QSD'ê ya bi balafirên bêmirov pêk hat. QSD'ê balafira wan a bê mirov anî xwarê di karmîreya wan de belge parve kir.
Êrişa Parmêla zincîrek ji xeleka rastiya hikûmeta veguhêz a Sûriyê ye. Amerîka jî ji bo hestê dewleta Tirk û berjewendiyên xwe yên bi wan re çavên xwe ji van rastiyan digre. Tevî kuştina leşkerên wê jî çavên xwe ji van rastiyan digre.
Ji xwe Amerîkî ezmûneke xwe ya demdirêj bi komên El Qaîda re li Îraqê heye û ew baş dizanin hikûmeta veguhêz û piştevanê wan û komên tundrew ên girêdayî wan dewleta Tirk û Qeter in. Tekoşîna herî serkeftî ya li dijî DAIŞ'ê û komên cîhadist rawestandina fînase û xetên piştgiriyê ne. Amerîka û Koalîsyona Navdewletî heta niha di vê derbarê de gavan navêjin. Heger di xeta xwe de dewam kir, dibe ezmûna wan sala 2003'yan li Îraqê pêk hat, dûbare bibe.



# 'Şêxmeqsûd û Eşrefiyê teslîmiyetê qebûl nakin'

Ji gelên ku ji 14 salan ve li hemberî dagirkeriyê, êriş, dorpêçkirin û siyasetên dewletên herêmî û navdewletî li ber xwe dane û tu carî çok ji dijmin re nedanîne; Gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bûn. Îro careke din li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî wateya vê yekê di cewher de kom dikin.

**Zana Roj/Heleb**

Piştî hatine hikumeta veguhêz jî vî gelî careke din li ser bingeha stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî careke din kêliyên serhildan û berxwedanê nû kirin. girêdayî vê mijarê Hevseroka Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Hêvîn Silêman bersiva pirsên me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Her du taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi berxwedaniya xwe û Şerê Gelê Şoreşgerî tên naskirin, Rêber Apo jî ev yek di şexsê gelê wir de nirxandibû. Gelo ev îlham û berxwedanî di seranserî 14 salan de ji kur tê û hûn çawa dinirxînin?**

Belê; Ger em berxwedaniya 14 salsan yê vî gelî di her du taxan de binirxînin, wê di destpêkê de em ê girêdana vî gelî bi felsefe û Tevgera Azadiyê re bikin yek. Em dizanin ku di taxên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd de piraniya wê gelê Efrînê jiyan dikin. Ji demên kevin de li vir dimînin û her du tax weke perçeyek ji Kurdistanê ne. Hatin û felsefeya Rêber Apo bandoreke pir mezin li ser gel kir, bi perspektîvên destpêkê ya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan û Tevegra Azadiyê jiyana xwe saz kirin. Li ser bîrdoziya xwebirêxistinkirin, perwerde û xweparastinê jiyana xwe avakirin. Bi Şoreşa 14'ê Tîrmehê re em dikarin bêjin gel amadebû ji bo hemû cure êriş û destavêtinan. Rêxistinbûna ku bi dehên salan e ku hatibû avakirin, di şerê hatiye derketin de rola xwe lîst. Ji ber wê yekê bi avakirina komîn, meclis û hêza xwe ya leşkerî berhema Şerê Gelê Şoreşgerî derket holê. Vî gelê bi siyaset û bûyerên li ser wan re derbas bûne, kêliyên



herî zehmet, yên herî bi êş û yên herî kêfxweşî jî bi hev re jiyan kirine û parve kirine. Serkeftinên ku di encama bedel û zarokên ji hembêza wan de hatine dayîn, ew serkeftin bi rihê hevgirtin û yekbûyînê dihat jiyankirin. Di dema redkirina komên çeteyan de û parastina texê de, şervan, jin, dayîk, zarok, kal û pîr hemûyan bi hev re di eniyekê de li gor îmkanên xwe yên alîkariyê û hêza xwe şer dikirin û parstin dikirin, di wan deman de tijîkirina cercûrekî ji mermiyan ji bo şervanekî/ê pir bi wate bû. Xwerinên ku bi destê dayîkan dihate çêkirin û belavkirin, dibû hêza piştgirtinê. Şervanan dizanîn ku li pişta wan bi hezaran ji gel, jin û zarokan hene ku divê bên parstin. Li ser van hîman vî gelî bi şervanên xwe re şer kir û bi ser ket.
Yekemîn tabora jin bi navê Şehîd Gulê Selmo hat avakirin ku bû nimûne ji hemû gel û jinên li taxê û hemû gelê Efrînê. Di 2016'an de rastî êrişên herî hovene hat, ev êriş ji aliyê çeteyên dewleta Tirk û hemû komên li dijî gelê Kurd ve hatin kirin.
Gelê me di her du taxan de teslîmiyet qebûl nekir, ne niha û ne piştre. Mîraseke pir mezin û dirêj yê Rêber Apo di van taxan de hatiye çandin û parstin ku hemû nifşên pêşerojê li ser wê yekê tên mezinkirin û perwerdekirin. Ev yek ne ku tê fêrkirin, lê di cihekî de ku bi qasî navçeyekê be û ji 14 salan ve tu her roj rûbirûyê pilan, polîtîka û êrişên dijmin be, helbet ev zarok û ev nifş wê li ser van rastiyan bên mezinkirin.

**Piştî rûxanidina rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz beriya salekê xwestin berê xwe bidin her du taxan. Bi derbasbûna salekê re, hûn kêliyên berxwedan û hevgirtina gelan di wê demê de çawa dinirxînin?**

Bi ketina Rêjîma Baas û hatina hikumeta nû re bi rastî jî hêviyekî pir mezin him li gel gelên Sûriyê û him jî li gel me hebû ku Sûriyê êdî derbasî rewşa ewlehî û aramiyê bibe. Her wiha siyasetekî demokratîk bê avakirin û gelê ku bi deh hezara şehîd daye, bighîne aştiyeke domdar. Lê belê mixabin ev yek pêk nehat, bi hatina xwe re her der weke tofanê talan kirin. Em dizanin ku gelê me yê Efrînê li Şehbayê ku jiyanek li ser hêviyên vegera Efrînê ji 7 salan ve avakiribûn, careke din bi hişmendiya nijadperest û olperest re hatin hedefgirtin. Hikumeta veguhêz çawa ku serweriya xwe li ser Sûriyê kir berê xwe da herêmên Şehbayê û Tl Rifet ku dixwest di wir de komkujiyan pêk bîne, lê belê gelê me careke din necar ma ku koçber bibe da ku di pêla qirkirinê re derbas nebe û derbasî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn.
Helbet ev yek bandora xwe li ser her du taxan jî kir, di wê demê de me kesekî nedizanî ka wê çi bibe çarenûsa gelên her du taxan wî çi be ne diyar bû. Lê belê vî gelê xwe li ser bingeha têkoşîn, şerkirin û xweparastinê biryar dabû. Ji lewra xwestin di destpêkê de êriş bikin hin hewildan jî hatin kirin, lê di encam de ev gel ji her du tax û malên xwe derneketin. Di 6'ê Kanûnê de xwestin êrişî taxê bikin. Gelê taxê bi hemû saziyên xwe ve weke seferberî îlan kirin û daketin ber haciz û derdora taxê çembereke ji gel avakirin. Gelê me wê demê xwestin ku bi awayekî aştiyane rê bên vekirin û tu êriş neyên çêkirin, lê berê bersiva wan jî êriş û topbaran bû. Gel bi rêveberiya texê re gav paş de neavêt û bi biryardarî li hember van êrişan li ber xwede, ji lewra vî gelî di van demên dawiyê de careke din biryardarî, hêz û îradeya xwe di bingehgirtina Şerê Gelê Şoreşgerî de îsbat kir. Berxwedana ku ji 14 salan ve û heyanî îro ji aliyê vî gelî tê raberkriin, nimûneya herî rast ya stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî ye. Tu kes nikare vê yekê înkar bike, rûxmî avakirina çemberê, dorpêçê, polîtîkeyên girtin û revandinê lê ne beriya salekê û ne jî niha ew rihê berxwedan û têkoşînê nehat vemirandin.

**Gelo rewşa heyî a her du taxan çawa ye, hêza îrade û berxwedanê ya gel rûxmî hemû hewildanên hikumeta veguhêz ku siyaseta xwe ji a rêjîma Baas ne cuda ye, çawa dinirxînin?**

Dema rêjîma Baas de û niha jî heman siyaset, nêzîkatî û pilan li ser me tên meşandin. Em dikarin bêjin ji dema berê tiştekî cudatir nehatiye kirin, tersî wê rûxmî hemû hewlidanên aştiyê, çareseriyê û aramiyê, lê hê jî siyaseta ambargo, Şerê Taybet û nêzîkatiyên ku li derdor taxê yên derveyî pîvanên exlaqî û mirovî didomînin.
Asta berxwedaniya gel her ku diçe bilndtir dibe, her ku ew dixwazin bi siyaseta dorpêçê îradeye gel têk binin, lê belê gelekî ku li hember vê siyasetê û jê xirabtir ji 14 salan ve têkoşîna parastin û hebûnê daye meşandin, helbet ev kiryarên derveyî pîvanên mirovî wê tu bandoreke neyînî neda avakirin. Armanc û niyeta wan heman armac û niyetên rêjîma Baas in, tenê dixwazin teslîmiyet û bêîradebûnê bidest bixin ku bi wê yekê Rêveberiya Xweser li vê derê vala derxînin. Ev yek ne mimkune, mîrasa Rêber Apo ya ku di nava gel de çandiye di vê cografiyê de bi Şerê Gelê Şoreşgerî tê parastin. Gel li vê derê parastina xeta Rêber Apo dike, ne top, ne êriş û ne jî pilan û lêstokên wan dikarin bandorê li biryardariya me bikin.



**Bîra Civakê**



## Di rastiya civakî de perwerde

**Ehmed Hesen**

Perwerde yek ji qadên herî girîng ên pêşveçûna civakan e, perwerde têgînek e ji bo hînkirin û zanakirina hişmendiya civakî ye, nexasim civakekê çiqas hîmên xwe yên perwerdekirinê parastibe û pêşde biribe, ewqas jî nêzî heqîqeta azadiyan dibe,
Di wateyek firehtir de, perwerde pêşketina mirov di warê kesayetiya wî de ji bo "mirovek" nîşan dide ku bi gelemperî bi taybetmendiyên rewşenbîrî, civakî û çandî ve girêdayî ye ku dikare wekî îdealê mirovê bi tevahî pêşketî di civakê de were hesibandin, em dikarin herikîn û çavkaniya hemû zanînên civakî û klasîkî yên kevn û nûjen di cewherê xam ê perwerdehiya azad de pênase bikin, çiqas asta perwerdekirina civakekê neyê beralîkirin, ewqas jî mirov nêzî heqîqetan dibe. Di konsepta perwerdeyên roja îro de ji zanîn û têgihîştinê bêhtir pere serwer e û bandor û kontrola xwe li ser qada perwerdehiyê kiriye, di heman demê de sînordarkirina qada perwerdehiyê rê li ber nezanbûneke çors a bi karîset vekiriye, pirsa ku niha di berdêla perwerdekirina zarokekî de tê kirin ev e:"Tu yê çiqas pere ji bo fêrkirinê bide min?" ev feraseta ku serwer e li şûna ku bibe çavkaniya çareserî û pêşketinê, berovajî wê rê li ber yekdestdarî û pêxirtengiyê vekiriye, di heman demê de di bin navê rêbazên nû yên perwerdehiyê de nezanbûneke herî mezin, di bin navê zanînê de bê zanîna herî xirab tê kirin, cara yekem kesê ku bombeya atomê çêkir, kir ku çêkirina wê bombeyê bibe sedema qetilkirina bi milyonan mirovan, nexasim hêzên yekdestdar ên ku di bin fermandariya moderníteya kapîtalîst de kar dikin, çi qadên ku xizmetê li mejiyê civakê dike veguherandine qada perezêdekirin û fînansê, her wiha ev qad ji bo kiryarên xeternak ên ku dikarin dawî li cîhana mirovan bînin, heya dawiyê û bê destûr dixebitin, ya ku encam dide jî têkçûna hewirdora civakî, xirabkirina sîstema cîhanê û hilweşîna avahiya xwezayê ye, li vir mirov nikare behsa perwerdeyê bike, ya rast a ku hat kirin rûxandina pîvan û exlaqê civakekê ye. Li Rojhilata Navîn perwerde qada ku têde kesayet bi Xweda û rahîban re dibin yek dihewîne û berovajîkirina rastiya dîroka mirovî her tim li pêş e, ya ku vê sîstematîze dike jî qiralên dewleta netewe ne, hema tu li kîjan sîstemên Rojhilata Navîn dinêre, tu kopîyek nûjen ji rahîbên Sumer û Babîlê dibîne, di bin navê her perwerdekirineke civakî de nasnameya dewletdariyê hatiye xemilandin û li pêşiya kerwanê zanistê pêşengiyê dike. Mirov dikare mînaka vê jî li welatên weke Sûriye di Serdema Esed û Şer'i de, Îraq di serdema Sedam de, Lîbya di serdema Mamer Qezafî de û hwd ji mînakên berbiçav hene, lewra jî li holê tiştek bi navê zanîn û pêşketina zihnî nehatiye hiştin. Heta dema ku em bala xwe didin perwerdehiyên olî jî, em têra xwe şaşiyên dîrokî dibînin, ji ber ku hemû xîtabên ku mile li mizgeftan didin, muhra dewleta netewe li ser tê dîtin, yên ku vê muhrê nepejirînin jî, bi mirinê re rû be rû ne. Heta ku mirov li cewhera civakî venegere, ne pêkan e ku di rastiya perwerdekirina nifşên civakî de bi ser bikeve.
Weke encam perwerde pîvana civakekê, mirovekî û çanda wê/î diyar dike, bi qasî ku di nava civakê de qada perwerdehiyê watedartir û firehtir bibe, ewqas jî watedayîna mirovbûn, civakbûn û nasnameya civakê mezintir dibe û dibe xwedî qabîleyeke serkeftî.